

# welat

Sal:2 Hejmar:55 7-13 Adar 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Bêyî jinan  
têkoşînên  
civakî  
serfiraz  
nabin

Rûpel 6



*Dewletê  
ji niha ve  
dest bi  
qetlîaman kir*

## Tirsa Newrozê

Newroz nêzîk dibe. Gelê Kurd ji do ve li hêviya pîrozkirina vê cejna neteweyî ye, haziriya Newrozeke ji hemû caran gurrter û geşir dike. Ev germahiya cejna Newrozê ji aliye dewletê ve jî tê dîtin û wê bi ferhê dixe. Dewlet jî, ji vêga ve li çareya vemirandina pîrozkirina cejna Newrozê digere. Ji bo vê jî, hêzên xwe li Kurdistanê zêde dike, bi reformîstan re rûdinê, bi nûçeyen derew behsa têkçûna şerê gerila dike. Bi vî rengî, diranê xwe yê bi bixwîn nîşanê gelê Kurd dide û dixwaze gel bitirse û beşdari pîrozkirina Newrozê nebe.

Nûneriya ERNK'a Ewrûpa ji bo pîrozkirina Newroza 93'an wiha bangî gelê Kurd dike: "Gelê Kurdistanê ku di nav xwîn û agir de keç û lawê xwe şehîd dide lazim e guh bide têkoşîna gerîla û serokatiya partiyê. Di dînyayê de têkoşîna herî meşrû û masdar ya gelê Kurd e. Gelê Kurd ê mensûbê vê têkoşînê li kîjan parçeyê Kurdistanê be bila bibe û li kîjan dewletê dijî bila bijî, pêwist e bi hemû qabiliyet û imkanen xwe, vê Newrozê pîroz bike û li ser piya, bersiva cejna Newrozê bide û agirê wê geşir bike."

Rûpel 8



8'ê Adarê li jinê Kurd û jinê dînyayê tev pîroz bel

Di wêne de, Jinê Kerboran di DGM'ya Diyarbekirê têr ditin.

**Mazrayê lanet, li  
kontrgerîla barand**

Cenazeyên Serokê Komeleya Mafêni Mirovan **Av. Metîn Can** û **Doktor Hasan Kaya**, bi beşdariya 6 hezar mirovi û bi protestoyen girseyî li Mazrayê (Elezîz) hatin veşartin.

Rûpel 5

**Li Kurdistanê  
jiyana bi stargeh**

Gel di nav şer de digihîje, ji kemasî û çewtiyê berê ders distîne. Ji ber nebûna an jî hindikbûna stargehan li Kurdistanê Newrozê û di dema şer de pirr şehîd dane.

Rûpel 3

**Însiyatîfa ronakbîrên Kurd**

Yaşar Kaya

**Eşref Bîtlîs û Hosta Necar**

Abdurrahman Durre

Rûpel 13

Bi Osman  
Sebrî re  
hevpeyvîn




**Edebiyata  
Kurdê  
welatê  
Şêwrê**

Rûpel 11



**Tabloyê  
xemgîn û  
îronîk**

Rûpel 13



Rûpel 16

# REWS

Abdullah Keskin



## Rojnamegeriya nû

**R**ojname ú kovarén Kurdan nakevin tu kategorian. Heç rojname ú kovarén ku li "welét" ú derveyî welét derdi Kevin ta-qib dike, bi reheti dikare vê idîayê bîne zimén.

Qedexetî ú asîmîlasyona li ser çand ú zimanê Kurdî birinê xedar di civaka me de vekirine. Mirov çiqasî bibêje jî hindik e. Ji ber vê qedexetiye weşanen bi Kurdî derneketine. Xwendin belav nebûye. Hê jî sazgeheke ku xwendin ú nivîsandina Kurdî bide hîkîrin nîn e.

Bi Kurdî li welét tu rojname ú kovarén balkêş derneketine. Ên ku derketiné ú niha derdi Kevin bi giştî teqlid in. Tesira rojname ú kovarén Tirkî sedemek ji yê vê teqlidkirinê ye. Li Bakur, insanên me ji weşanen Tirkî pê ve zêde tu weşanan nas nakin. Rojnameyên Tirkî jî her yekî rojname an kovareke Ewrûpa teqlid dikan. Li dawiyê em teqlidîn teqlidîn diceribîn.

Di serê insanên me yên xwende de rojnameya herî pêşverû **Cumhuriyet** e. Demeke dirêj Cumhuriyet an di bin milan de an ji di berîkan de wek nîşana pêşverûti ú şoreşgeriyê dihate hesibandin. Li Tirkîyê dewlet bi her qalikî ú şiklî xwe bazar dike. Cumhuriyet jî, qalika dewletê a herî kevn e. Iro em di-

bînin ku tu rojname wek Cumhuriyetê ji tiştîn nû re girtî nîn in. Sansura li Cumhuriyetê bawer nakim li tu rojnameyên din hebe. Ev rojname ev 70 sal e derdi keve lê hê jî bi ser 70 hezarî neketiye. Ev pîrsîrêk bi têkiliyên rojnamê ú civakê xwendevan ve girêdayî ye.

Beri her tiştî rojname ne weşaneke teorîk e. Nivîsên teorîk jî, di rojnameyan de têne weşandin lê bi sînor in. Rojname gerek e hîtabî her qada civakê bike. Neynika civakê ye rojname.

**Beri her tiştî rojname ne weşaneke teorîk e. Nivîsên teorîk jî, di rojnameyan de têne weşandin lê bi sînor in. Rojname gerek e hîtabî her qada civakê bike. Neynika civakê ye rojname. Nivîsên rojnameyekê gerek e bala rewşenbiran ú mirokî gundi jî bikişîne. Ne hewce ye herkes her nivîsê bixwîne lê divê herkes tiştî ji xwe di rojnameyê de bibîne.**

Nivîsên rojnameyekê gerek e bala rewşenbiran ú mirovîkî gundi jî bikişîne. Ne hewce ye herkes her nivîsê bixwîne lê divê herkes tiştî ji xwe di rojnameyê de bibîne.

Li dînyayê dema rojnameyên fikriyê klasik xelas bû. **Le Monde**, rojna-

meya Fransî tesîra wê li ser politika dînyayê û hemû welatan heye, mixabin tîraja wê roj bi roj kêm dibe. Xwendevan êdî rojnameyên rehet û hêsan tercîh dikan. Rojnameyeke xwerû politik nagîhîje sedhezarân.

Însanên me bi qaliban rûdinîn û râdibin. Çarçoveya politikayê teng dikan. Politika ne tenê formulasyonê ideolojîk in. Wek filozofekî Yewnan ê Antîk dibêje, "Gerek e her tiştî ku bi insen re eleqa wî heye, ji mirov re ne biyanî be." Cihêregî, dewlemendiya civakê ye.

Ev peyv tev de nayen wê maneyê ku rojname bêali an ji bêmîsyon e. Mirov dikare bibêje ku li Tirkîyê rojnameyên bêterf û "objektif", rojnameyên Kurdan e. Rojnameya me ya herî siyasi wek rojnameyên magazinê yê Tirkînikarin li welat û gelê xwe xwedî derkevin. Divê mirov rola rojnameyê baş zanibe. Mesela rojname ne weşaneke ku dersên zimén bide û hînî zimén bike. Dikare zimanê mirov bi pêş bixe. Ji aliyê zimén ve gelek fêdeyên wê hene. Gerek e mîsyona rojnameyên bi tiştîkî tenê neyê sînorkirin.

Tu caran em wek neteweyekî li xwe nanêrin. Belkî ji vê yekê rojname ú kovarén me hemû li dora komekê an ji klîkekî diçin û têr. Ji xwe re binivîs û ji xwe re bixwîne! Wek çepen Tirkan. Cihê tevgerên berê kovarén mehanedigirin. Ew jî, ji çend mehan carekê derdi Kevin. Rewşa me ne weke ya wan e.

Divê em serê xwe ji qûmê derxin û hînekî firehtir bimeyzînin. Çarçoveya rojname ú kovarén xwe ji nû ve muhabîse bikin.

## FERHENGOK

- Azmûn: İmtihan (sinav)
- Bang: Gazi
- Berbiçav: Şenber (sömüt)
- Beşdarî: Tevibün (katılma)
- Behitîn: Bizdandin
- Biwêj: Terim, idiom (deym)
- Cejn: Id (bayram)
- Cerd: (baskın, atak)
- Çavdêr: Nîrvan (Gözleme)
- Çin: Tebeqeya civaki (sınıf)
- Dadgêh: (mahkeme)
- Danişin: Rûniştina dadgêh (duruşma)
- Dexel: Giyât biyani
- Dijûn: Sixef, çér (küfür)
- Eger: Faktör
- Erk: Peywir, wezife
- Fetlanek: Zivirek (dönemeç)
- Fitirin: Roji vekirin
- Gerinek: (girdap)
- Gewre: Mezin, gir
- Girav: Girde (ada)
- Gili: Gazin, şikayet
- Hêvi: (umut)
- Gumrah: Agirmez
- Kox: Kolit, pin (kümes)
- Merc: Hoy, şert
- Nenêrbar: Nedîtbar (soyut)
- Notirvan: Nobetdar (bekçi)
- Parzemîn: (kita)
- Pergin: Pêşwazi (karşılık)
- Perwerde: (eğitim)
- Peyâ: Zilam
- Pirozi: (kutlamaya)
- Pirozkirin: (kutlamak)
- Pirozbahî: (kutlama)
- Pêscingî: (öncülük)
- Pûrt: (Tüy)
- Serecem: Serece
- Stargeh: Stare (siginmak)
- Şuret: Xemîl
- Şîlandin: (sogun)
- Têgin: Terim
- Têqez: Mumkun
- Tomar: Tije
- Xulam: Noker (uşak)
- Xwedégiravî: Qaço, keno (güya)

## Divê em li zimanê xwe xwedî derkevin

Merheba niviskar, xebatkar û xwendevanen Welat. Beri her tiştî, em girtiyê azadiyê, bi şahi ú bi dileki xwe silavê şoreşgeri ji we niviskar, xebatkar û xwendevanen Welat re dişinin.

Niviskar û xebatkaren Welat, we ev salek e ku, her hefti bi cangoriti rojnameya Welat bi me xwendevanen da xwendin. Bi vê cangoriti û xebata we, em pîr kîfxweş û dîlxwes in. U ji bo vê xebata we, em pîr spas dikan.

Ev salek e ku, bi kuştinan û bi işkencyan rojnameya Welat her hefti derdi keve û sala xwe ya yekemin tije kir (dagirt). Em girtiyê azadiyê yê li Bur-sayê, sersala rojnameya Welat a yekemin, ji hemû niviskar û xebatkarê Welat re, ji me girtiyê azadiyê re û ji hemû xwendevanen re pîr be.

Di sala duyemin de ji daxwaza me ew e ku, rojnameya Welat heri rind û baş bê weşandin. U jiyana xwe dom bîke û em ji bi kîfxweşî bixwînin. Gotina me ya kurt li ser

zimanê netewiya me ye; dema ku rojnameya Welat nû hate weşandin, hejmarên pêsi bala me zehf nekişandibû. Lewre me ji xwe re digot, "Rojnameya xwerû bi Kurdî zehf baş e, lê belê em bi Kurdî baş nizanîn bixwînin û xwendina Kurdî pîr zor e û bi xwendina Kurdî dema me zehf diçe. Bi vê sedemê ji em di vê pêvajoye de, bi Kurdî nexwinin ji dibe."

Ji bo ku gotin û nivisa bi Tirkî ji me re hêsanter bû, bi gelempéri ji, me Welat hemû nedixwend. Sedema bi Kurdî nexwendinê ji, me ji xwe re digot,

"Heya demek berê ji, em bi Tirkî difikirin û bi Tirkî dipeyîvin. An ji bi Tirkî difikirin û bi Kurdî dipeyîvin. Bi vê sedemê ji me bi pirrani peyvîn bi Kurdî, ji bir kiriye. U xwerû bi Kurdî ji em nizanîn dipeyîvin. Gava ku em dixwazin, em bi Kurdî dipeyîvin. Ev rewş ji, ji me re pîr zor dibe. Jixwe heyâ iro me di dibistanê Tirkî de, bi zimanê Tirkî xwendû di vê demê de ji, em bi zimanê Tirkî pîrtukan dixwînin. Jixwe em ji berê ve, zimanê

xwe baş nizanîn. Dema ku Kurdistan xelas bû, eme ji wê demê giraniyê bidin ser hinbûna zimanê Kurdî. Em wê demê zimanê Kurdî baş hinbibin. Lî vê demê hinbûna Kurdî ne teqez e. Em vê demê nîyi bi Tirkî, nîyi bi Kurdî idare dikan. Mirovîku bi zimanê xwe nikaribe baş bifikire û bipevive wê çawa binivîse. Ez iro di vê rewş de, bi Kurdî bifikirim û bipeyîvîm û binivîsim ji, ma ji min re pêwist e? Ma ezebibim profesorê zimanê Kurdî."

Belê dema rojnameya Welat nû derket em wilo difikirin. Dawiyê de me nîhert ku ev ramana, ramaneke pîr çewt e. Heya demek berê ji, ev kêmâsiya me hebû û ev kêmâsi ji, kêmâsiyeke pîr mezin bû. Lî iro ji bo peyvin û nivîsandina Kurdî, me ramana xwe guhertive. A rastî, têkoşina li welat ramana me guhert. Lewre li welat têkoşineke mezin û germ dom dike. Têkoşin çiqasî dibe û pêşve diçe, gîringîya Kurdî ji ewqas mezin dibe.

Ev 70 sal e ku, zimanê Kur-

di di bin asîmîlasyona TC'ê (Komara Tirk) de ye ú TC zimanê Kurdi qedexe kiriye. Lî iro têkoşina li welat asîmîlasyona li ser zimanê Kurdi şikandiye. U qedexeyê li ser zimanê Kurdi bela wela kiriye.

Ziman xezineye welat e. Lî ev 70 sal e ku TC vê xezîna welatê me xistiye 7 qat binê erdê. Têkoşina li welat vê derxist ser erdê. İca divê ku em ji li vê xezîna xwe xwedî derkevin û baş hinbibin û geş bîkin.

Di dawîya nivisa xwe de, eme ji bo rewş girtigehan ji çend gotina binivîsinin: Hün ji dizanîn ku di van rojan de, di girtigehen Tirkî de buyeren mezin çebûn û gelek şoreşger xwe bi destê xwe azad kiri. Lî belê dijmin, azadbûna van şoreşgera tebat (tehamul) nekir. U li hemû girtigehan mafê girtiyan bi sün ve standin. İro daxwaziya dijmin, girtiyan ji nû ve "islah" bike ye.

Dema we xweş be, bi silavan.

**Sîncô û Bêziman  
Girtigeha Taybeti / Bursa**

## Ji keç û xortê

### Kurd re

Gotinek e pêşîyan îreyc, dibêjin, "Nizanîm, rehati ve canîm". Belê iro "nizanîm" ketîye devîn mirovîn Kurd. Dema ku mirovîke/i Kurd dibêje, "Ez nizanîm" mirov pîr diqe-hire. Iro gelek ciwan û kalen welatparêz mina Abdurrahman Durre û şehid Musa Anter bi pînûşen xwe yê tûj li diji "nizanîm" şer dikan. Em du ciwanen Kurd ji bo ku piştgîriya xwe ji rojname Welat re nişan bidin me "gotinên pêşîyan" berhev kir.

Di berhevkirinê de gelek welatparêzen Kurd ji me re bûn alikar. Em ji wan re pîr spasdar in. Gotinen ku me berhev kîrin pirrani ji Cizira Bojan têr.

Iro welatê me Kurdistan (her çar parçê) di demeke wisa de ye ku, mirov ne baweriya xwe bi Tirk, Eem û Ereb, ne ji baweriya xwe bi Amerika-yîn ser zer bîne.

Pêşîyan me ci gotine, "Romî nevar in, le Osmanî març kor in". Divê em welateki gul û gulistan teslimê zaroyen xwe bikin, ji bo yê ji biratî û baweri pêwist e. Mirov incex ji gelê xwe bawer bike!

**Girina Ciziri û  
A.Kadir Kasırga**

## Qetliamên cerdevan

Di 27.2.1993'an de, di riya Cizirê û Şîrnexê de 3 esnaf ji aliyê cerdevan ve, di nav erebeyen xwe de hatine şewitandin. Di 27'ê Sibatê de 3 esnafen Cizirî ji bo helkirina karê xwe, serê sibê saet di navbera 8-9'an bi erekbeyen xwe dikevin re. Di re de erekbe (riya Cizirê û Şîrnexê) ji aliyê cerdevanen gundê Kumçatî (Dêrgül) ve tê sekinandin. Pişti kontrolkirina nasnameyan, cerdevan ev 3 esnaf û karkeran di nav erekbeyen wan de, bi saxiti dişewitin. Ew 3 kes bi erekbeyen xwe ve dişewitin û dimirin.

Der heqê vê büyerê de ji xeyni navê van her sê kesan, tu agahî nehate standin. Navê wan ev in: Osman Acar (35) karker, Lokman Güven (40) esnaf û Cemal Bozkurt. Cenazeyen wan, li Cizirê, bi beşdariya girseyekî gurr, eyni roj saet li 12'an hate veşartin. Ji aliyê din ve 26'ê Sibatê bi şev di navçeya Cizirê de, hêzên dewletê cerdi ser mala esnaf Hizbullah Sabuncu dikan û wi digirin binçav. Ev büyer li ser ihbarekê qewimiye.

## Li Amedê livbaziyên qorsan

Li Amedê di nav rojekê de du livbaziyên qorsan çebûn. Roja 1.3.1993'an li kolaneke Baxlar, Göcmenler û li dora Saxlik Ocaxiya Baxlarê, ji terefe Yekitiya Ciwanen Welatparçen Kurdistanê ve du livbazi hatin çekirin.

Ev livbazi ji bo destekkirina Meclisa Neteweyi ji bo protestokirina işkenciyen li zindanan û ji bo qetliamên ku li Kurdistanê çedibin, hatin li dar xistin.


Dî livbaziyan de sloganên wiha hatin avçtin. "Biji Meclisa Neteweyi, Biji Berxwedanen li zindanan, Biji PKK, Biji Serok û, Bimire dewleta kontra."

## Li Dêrikê binçavkirin


Li Dêrikê roja 25.02.1993'an di merasima cenaçeyê gerilayê ARGK Remzi Çetinkaya de gelek kes hatin binçavkirin. Ji 800 mirovên ku beşdari merasimê bûbûn, 150'yê wan jin 650 kes hatin girtin. Dora rojê meşvanen jin hatin berdan yê din ji li Dêrikê hatin girtin.

Ji van kesen di binçav de, Metin Yapıstiran, Seydoş Daniş, Ali Erek, Osman Orman, Erkan Özgen, pişti pirsiyariya pêva-joya du rojan 1'ê Adarê ji aliyê dozgeriya (savcılık) Dêrikê ve hatin tewqifkirin.

# Li Kurdistanê jiyana bi stargeh



Deriyê stargehê



Stargeha di nav malê de

**Navenda Nûçeyan-** Bi nêzikbüna Newrozê re; li Cizirê, Şîrnexê, Hezexê (İdil) û Silopiye, gel bi lez û bez ji xwe re stargehan çedike. Tesira Newroza sala 1992'an xwe li ser gel nişan dide û naxwaze careke din wek sala berê bêparastin bimine. Ji ber vê yekê li gelek deveren Kurdistanê û bi girani li hêla Botan zehfîn milet ji bo çekirina stargehan seferber bûne.

Milet giringiyeke mezin dide stargehan, ji ber dema ku top û tanqên dewletê mirov û xaniyan didin ber gulle û şîşekan ev stargeh pirr bi keri milet tê. Ev stargeh ne tenê ji bo demen kurt, lê ji bo bombardimanen ku bi rojan an ji hefteyan dom dikan ji tê amadekirin.

Ji bo 3'ê ji gel, xwarin, vexwarin lembe û navgîmên cur be cur di stargehên xwe de digirin. Di çekirina stargehan de, li hinek deveran hin malbat bi hev re alikariyê ji dikin da ku di demeke kurt de çebikin.

Zehfîn gelê herêmê di wê ditinê de ye ku, bi saya stargehan re li ber qetliaman dikare bê gitin. Büyera Şîrnexê ya dawi ji vê baş nişan dide. Şîrnexî dibêjin ku ger ne ji stargehan buya, wê qetliameke mezin çebûya.

Gelê Kurd, bi taybeti yê Botanê ji büyer û serpêhatiyen sala çûyi, teerûbe û ders standiye û ji bo careke din nekeve rewşa Newroza sala 92'an, amadekariyê dikin û stargeh di nava van amadekariyan de cihekî giring

digire; wek nan û av, stargeh ji pêdiyiveke ji bo jiyana gelê Kurd ê ku iro di nava şertén cengê de diji.

Li aliyê din, dewlet ji amadekariya Newrozê dike. Ji destpêka meha, Adarê ve, dewlet hejmara leşker û komandoyan li Kurdistanê zêde dike û li devera Katran û Çigir (navbera Nisêbin û Cizirê) çek û silehan dixe depoyan.

Li Cizirê û Silopiye, dewlet di hoparlörên Belediyê de anonsan dike da ku milet teker û lastikên li cem xwe bibe teslimê Emniyetê bike, an ji bayeje çemê Dicleyê.

Esnafen Cizirê û Nisêbinê ji, hatin iżaqzirin ku di nava du rojan de lastik, teker û varêlén xwe yênen benzin û mazotê teslimi

dewletê bikin.

Li Şîrnexê ji di van hefteyen dawi de, zêdekirina hejmara komando û timan bala gel kişandê ser xwe. Li gor telefonen ji Şîrnexê ji me re tê, di van herdu hefteyen dawi de, dewletê bi hezaran komando û timen nû ji Kayseri sewqê Şîrnexê kirine.

Li aliyeke dewlet behsa resmi kirina cejna Newrozê dike, li aliyê din, hejmara tim û komandoyen xwe zêde dike û hé ji vê gavê dixwaze çavê gel bitirsine û bibêje, "Binê ku hûn Newrozê piroz bikin emê qetliamên mezin çebikin!" Lé wîsa xuyan dike çavê gelê Kurd bi vê ji natirse û ew ji di ber xwe de ji vê gavê amadekari û tedbirên xwe ji bo pirozkirina Newrozê zêde dike.

## Dewlet bi tariyê rastî veşart

**Navenda Nûçeyan-** Programa der heqê Batmanê de, ji aliyê Batmaniyan vê, ji ber birrina elektrikê, nehate temaşekirin. Li ser vê yekê Batmani pirr hêrsûn û daxwaza car din derxistina vê programê kiran.

28'ê Sibatê, roja yekşemê, pişti nîvro saet li 1'ê, di televizyona Kanal 6 de, programek li ser rewşa Batmanê hate pêşkêşkirin. Di vê programê de, du rojnameyan Aydin Engin û

Koray Düzgören li ser failen meçhûl, hizbikontra û PKK'ê, ditin û çavdêriyên xwe anîn ziman û li ser têkiliyên hizb-i kontra û dewletê delîlen berbiçav dan xuyakirin. Rojnameyan Aydin Engin li ser rewşa dewletê ya li Kurdistanê û bi taybeti ji li Batmanê, bi kurti wiha got:

"Dewlet, ji bo ré li ber pêşvêcûn û büyerên herêmê bigire û xwe bi hêz û xurt nişan bide, li gelek gund û bajaran cerdevan dixe

bin xizmeta xwe û bi kar tîne. Bi destê van cerdevan zilm û zorê li gel dike, dixwaze çavê gel bitirsine. Lé li Batmanê, sistema cerdevaniyê rûnenîş. Niha li Batmanê hizbikontra rola cerdevan pêk tîne. Ev ji bi keri dewletê tê."

Ev programa ku gelê Batmanê pirr meraq dikir û li hêvîyê bû, hina dest pê nekiribû elektrik hate bîrrin. Li ser vê yekê Batmaniyan telefonê reyisê bele-

diyê kirin. Wi ji got, ku tu elâqa wan bi bîrrîna elektrikê re tûne.

Gelek kesen Batmani idia kîrin ku, bi zanebûn ev elektrik ji aliyê dewletê an ji kontr-gerîlayan ve hatiye bîrrin, da ku Batmani li programê temaşê nekin û di bin tesira wê de neminin.

Li aliyê din, raycedarên Kanal 6, dan xuyakirin ku ihtimal heye li ser daxwaza Batmaniyan ev program careke din bê pêşkêşirin.

## Li Bilîsê rêveberiya taybetî

**Bilîs, Welat-** Dewlet, ji bo Bilîsê ji bixe nav "herêma rêveberiya taybetî" li du provakasyon û listikan digere. Ji niha ve hejmara tim û leşkeran du qat kirine, Bilîs û navçeyen wê, bi taybeti ji Tetwanê bi panzeren Almani dagirtine. Li gor agahîyan li Mûşê ji, amadekariyên bi vi rengi bi tundi didomin.

Tixûbîn (sinor) "herêma rêveberiya taybetî" bi awayê ku Bilîsê ji bixe nav xwe, tê firehkîrin. Bi vê awayî ji, ev sistem li hemû Kurdistanê tê belavkîrin. Hikûmet ji bo dikaribe Bilîsê ji bixe nav tixûbî "rêveberiya taybetî", pêşî hejmara

hêzên leşkeri û çekên giran zêde kîrin. Bi sedan timen taybeti li herêmê bi cih kîrin û bi destê van hézân pêkutî û zîlma xwe dijwarît kirin. Her roj bi dehan kes ji malen xwe têne birin û bi rojan kes tu agahî ji wan nagire. Èrişen kontrayan ji, li Bilîs û navçeyen wê didomin. Heta niha li Tetwanê nêziki 10 kes bi èrişen wiha an birindar bûne an ji hatine kuştin. Nêziki 10 roj berê ji, li ser riya Norşînê, 2 kes di benzînxaneya xwe de bi èrişke kontrayan hatibûne kuştin.

Ber bi Newrozê ve, ev amadekariyên dewletê, di nav gel de, bi

awayekî din têne şirovîkirin. Li gorî ku di nav gel de tê xeberdan, ji van amadekariyan bêhna prova-kasyon û qetliamekê tê. Lewre tu car li Bilîsê ji yek panzeri pê ve ne-hatiye bi cih kîrin. Niha bi dehan panzeren Almani û li gorî vê ji tim û leşker di Bilîsê de bi cih bûne.

### BELAVKARÊN WELAT Û YENÎ ÜLKE DÎ BİN ÇAV DE

Roja 28'ê Sibatê belavkarên Welat û Yenî Ülke li ser riya Bilîsê hatin girtin. Polisîn Emniyeta Bilîsê ji ber di erekbea belavkaran de herdu rojnameyan dibinin, wan digirin û dest datin ser rojname-

yan. Dû re li Emniyeta Bilîsê ew tehdit dikin ku van herdu rojnameyan nexin nav sinorîn Bilîsê. Belavkar pişti şevek di hundir de dimîn têne berdan, lé gef û tehdîten polisan li ser wan didome. Li gor agahîyan nûçegihanen me gîhandin Welat, polis ji dû wan naqetin û tehdidîn xwe li her derê didominin. Li ser van kîrinên hêzên dewletê, xelkê li herêmê, ji bo rojnameyan xwe belav bikin seferber bûne. Gel naxwaze bi tu awayi xwe ji rojnameyan xwe qut bike. Ji ber vê yekê bi coş û mora-leke bilind destekên xwe pêşkêş dikin.

*Li Swîsre panel û şeva piştgiriya Özgür Gündemê*

# 'Em rojnameya xwe dixwazin'

Swîsre, Welat- Li bajare Swîsre Zurich'ê roja 27'ê Sibatê, aligirên kovarên Dayanişma, Emek, Newroz, Devrimci İşçi û Kurultuș panel û şevkê amade kirin. Ev panel û şeva piştgiriye, bi aliyezi xwe ve bû weke civina rewşa çepen Tirk, li hember têkoşina neteweyi ya Kurdistanê.

Li ser navê Rojnameya Özgür Gündemê, xwediyê wê Yaşar Kaya, niviskarên wê Haluk Gerger û Ertuğrul Kürkçü beşdarî panelê bûn. Li ser navê kovaran ji, ji kovara Dayanişma M. Emin Sert, Ji Emek'ê Engin Erkîner, Ji Newrozê Hüseyîn Îçli, Ji Devrimci İşçi İbrâhîm Sevîmlî û ji Kurtuluş Mahîr Sayîn beşdar bûbûn. Şeva piştgiriye ji, bi beşdariya hozan-niviskar Nihat

Behram, hunermend Ali Asker, Serdar û koma folklorê Serhilî dan û koma folklorê ya zarokan Kütüs pêk hat. Ji 500 kesi zedetir temâşevanen şevê hebûn.

Di panelê de axaftina yekemin ya Yaşar Kaya bû. Yaşar Kaya li ser politikayê Özgür Gündemê rawestiya û wiha goti "Hêzên çep ên Tirkîyê, bi her awayi, xwe û ditinên xwe di rojnameye de anî zîmîn. Lî siyasetvanen Kurd, di rûpêlén ku ji wan re hatîbî vejetandin de tu aktivite nişan nedan. Dê ev politikayê me neguherin. Ger li Kurdistanê şer bilind bibe, dê Özgür Gündem ji peywira xwe pêk bine. Dibe ku weke berê nerm nin be. Lî ev girêdayîyê politikayê dewleta Tirk e." Pişti axaftina Yaşar Kaya, axaftvanen din

ji bi dorê, dora gotinê standin û bi giştî li ser rewşa Kurdistanê, têkiliyê rëexistinê Tirk, têkoşina neteweyi û serokatiya PKK'ê rawestiyan.


Niviskarê Özgür Gündemê Haluk Gerger ji di axaftina xwe de li ser van xalan sekini: "Bi giştî me tevan digot qey, me dinya a-zadiyê keşf kiriye. Lî tevgera Kurdistanê nişanî me da ku ev ne rast e. Li ser me nexweşinîn kermalizmê û yekitiya neteweyi he-ne. Hin ji me vê yekê dibinin û li hember derdikeyin, hin ji me ji inkar dikan".

Pişti vê axaftinê nûneren kovaran her yek axaftina xwe kir û pîrsên beşdarvanan bersivandin. Niviskarê Özgür Gündemê Ertuğrul Kürkçü ji axaftinekê kir.

Kürkçü bi kurtî wiha got: "Iro pîrsa yekemin ew e ku, herkes bi bingeha enternasyonalizmeke rast, li diji hemû tixûbén 'Misak-i Mili' derkeve. Iro me ji vê buharitiye û em vê yekê deyndarê teygera PKK'ê ne, lewre wan çavên me vevir."

Panel bi pîrs û bersivên beşdarvan û panelistan qedîya. Di panelê de guftûgoyen gelek giring hatîn kîrin. U dû re, bi şeveke delal û rengin, herkesi stresa panelê ji ser xwe avêt. Nihat Behram bi helbesten xwe, Ali Asker û Sevim Kiraz ji bi saz û dengen xwe di nava beşdarvanan de coşke bilind peyda kîrin.

Pişti panel û şevê, di devê herkesi de, yek gotinek hebû: "Em rojnameya xwe dixwazin."



## Kurd guhdarvan bûn

Dî 27'ê Sibata 1993'yan de li Stenbolê di Otela The Marmara de sempozyûma bi navê "İnsiyatîfa Rewşenbirê Kurd" çebû.

Nêziki 400 kesi vexwendiyen (daveti) sempozyûmê bûn. Tevi vexwendiyen dor 200 kesi beşdarî sempozyûmê bûn.

Gelek mirovên ku vexwendiyen sempozyûmê bûn, bi sedema ku ev kes gel û rewşenbirê Kurd temsîl nakan beşdar nebûn.

Di sempozyûmê de nûneren partîyen siyasi (DYP, SHP, ANAP...) û rewşenbirê Tirk teblîx dan. Kurdan ji li wan guhdarî kîrin. Serokê Heyeta Rêvebiriya Navenda Çanda Mezopotamya İbrahim Gürbüz li ser nebeşdarbûna xwe daxuyaniyek belav kîr. İbrahim Gürbüz ditinên xwe wiha bi rez kîr.

"Di metna vexwendinê de té diyarkirin ku, kesen sempozyûmê li dar xistine û yên teblîxa didin û şirove dikan di vi warî de 'pispor' in. Lî li gor min ev kes di pratika jiyana xwe de, ji bo serfiraziya Kurdan tu xebatên berbiçav (somut) nekirine. Beri hert tiştî ev bala mirov dikişine. Rewşenbirê ku di temamî jiyana xwe de ji bo serfiraziya Kurdan xebitine û berheman çekirine, ne di nava sazkarên sempozyûmê de ne! Ev komîn ku xwe bi "İnsiyatîfa Rewşenbirê Kurd" bi nav dikan, tev di nav çarçoveya reformizmê de bi pirsgirêka Kurdan ve eleqedar bûne. Heger xwe "rewşenbir" bihesi-

binin ji, li gor şertîn rewşenbiriyê ji bo têkoşina rîzgariya Kurdan tu xebatên wan nîn in. Vêca ev kes selahetiya "insiyatîfa Rewşenbirîya Kurd" ji kur, di xwe de dibinin? Ev ji aliyezi, di çareserkirina pirsgirêka Kurdan de (li hember nûneren gelê Kurd yên rast) xwe xwedî insiyatîf û nûner ditin, ji bo gelê Kurd bêhurmetiyekê mezin e. Gelê me nûneren xwe dizane û li piş wan e. Gelê Kurd bi tu awayi piştgiriya van kes û koman nakek. Ez beşdarî vê sempozyûmê nebûm. Lewre ev kom û kes, çareserkirina pirsgirêka Kurd di nav sinorîn dewleta uniter de dibinin û iradeya gelê Kurd, di pişt guhê xwe re diavêjin."

## KEMAL KILIÇ



Pişti kekê min Huseyîn Deniz û xalê min Musa Anter, niha ji, hevalê min Kemal Kılıç tevî karwana şehîden çapemeniyê bû.

Hûn li ser axa welatê me, mîna gulên sor vebûn. Em qatilên we dinasin. Bila gelê me û Welat sax be.

*Li ser navê welatparêzên Serêkaniyê (Ceylanpinar) / Adile Deniz*

## Dadgehkirina dewleta Alman ji bo doza Kurdî

Berlin, Welat- Çend hêzên Almanî dewleta Alman dane dadgehê. Medico International, Partiya Keskan, PDS/LL (Partiya Sosyalistên Demokrat ji listeya çep) û hin hêz û rëexistinê din wek hevgirtina (koma) parêzgerên (evûqatên) cumhûrîwaz û hînek mirovên serbixe dewleta Alman ji bo aîkârîkirina di tunekirina gelê Kurd de dane dadgehê. Ew hêz û mirovên ku dixwazin aîkâriya vê kampanyayê bikin, dîkarin bi adresâ jêr re danûstandinê bikin.

**Adresse:** Ra Hans-Eberhard Schultz Lindenstr. 14  
W-2820 Bremen 70

## GOTIN



Yaşar Kaya

## 'İnsiyatîfa Ronakbîrên Kurd'

Dî 27'ê Sibatê de, li Stenbolê di Otela The Marmara de, civîna İnsiyatîfa Ronakbîrên Kurd he-bû. Vê civînê, çend roj berê ilan kiribûn. Bi gotina wan, êdî wext hatîbû. Gereke êdî Kurd bihatana naskirin. Li gorî wan, heta niha kesî rastiya (realîta) Kurdan nas nekiribû. Ev belengazên bêaqîl weke Süleyman Demîrel ji nedibûn. Xwîn-warê Kurdan Süleyman Demîrel, salekê berê çûbû Kurdistanê û gotibû, "Em rastiya Kurdan nas dikan". Ev belengaz gelê ji dûr ve mane.

Lê belê em dê ji wan re dibêjin. Realîta Kurdan, îsal deh sal e li çiyyâyen Kurdistanê ew xwîna sor a rîjiyayî ye, keç û xorîn şehîd in, gundêni ber gullan, jîn û zarokêni kuştî ne, sîrgûn e, qirkirina gelê Kurd e. Ji korîtyen wiha re, dibêjin 'korîtya siyasi'. Realîta Kurdan, 'birçîbûna Bruselê' ye. Nav û dengê wê, çû dinê, erd û ezmanan. Jin, qız û xor xwe xemîlandibûn, xwe dabûne der û dorêñ endamên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê. Bi şev û rojê govend digirtin.

Dengê azadî û serfiraziyê, ji aliyezi ve diçû Zîndana Diyarbekirê, ji aliyezi din ve diçû Mahabadê, Efrînê, Erbilê, Koy-sancaqê, Agiriyê, Dêrsimê. An çavê wan kor e, an ji guhê wan kerr e. Ev tiştî ku ew dikan realîta Kurdan nîn e.

Nav li xwe kirine 'Ronakbîrên Kurd.' Hoy lo lol.. Di nava van pepûkan de, çend kes xwedî ilm û irtfan in? Çend pîr-tükîn wan hene? Çend heb nivîskar çend heb rojnamevan, çend zimanزان, çend dîrokvan hene? Hînek gîl û gemar gîhiştine ser hev, ji xwe re dibêjin 'Ronakbîrên Kurd' (!)

**Ev 10-15 sal in, Kurdistan di nav agirekî gumrah de dişuxule. Van camêran teze bi xwe hesiyane. HEP tê damezirandin, evana tune ne, Enstituya Kurdî ava dibe van camêran tune ne. Ji her tiştî tirs û xofa wan heye. Lê belê, salê carekî dicivin ser hev, ji xwe re klamen Kurdistanê dibêjin.**


Beriya her tiştî, ev kesen han, ketine dest û piyîn Murat Belge û jîna wî. Tu dibêjin qey ji bo Kurdan sedeqe dixwazin. Evana ne mîr in, ne ji mîrxas. Şerm nekin, hewce nîn e, netirsin, bibêjin em "rastê" Kurdan in. Em dê partiya xwe

çêkin. Em ji Kurdistanê wiha dixwazin. Bi vê rewşê be, rast e. Nekevine dest û piyîn xelkê. Lî tiştîkî din heye. Van camêran ji bo Kurd û Kurdistanê heta niha ci kirine? Di nav kîjan şerî de ne? Ne li şahîyê hene, ne ji li şînê. Hînek jê, ji bo mutehîdiya xwe dixebeitin, hînek ji, ji bo xan û hemâmên xwe. Na welle; gerek mirov ji bir neke, hînek ji, hîngî ku ji TKP'ê belav bûne, bê xwedî û bê xwedan li derive mane, paşê Kurdistan hatîye bîra wan. Evana berê ne Kurd bûn, hê ji, ji Kurdiyê direvin. Salê carekî, mîna mişkan ji binê xweliyê derdikeyin, serê xwe hildidin, li dinê ci heye, ci tune ye, dinêrin û ji nû ve serê xwe dixine binê xweliyê. Evana wisa nin, gelê Kurd wan rind nas dike. Tiştîkî din ji heye. Ji tîrsa xwe nikarin ji bo Kurd û Kurdistanê tiştîkî bibêjin. Tirsonek in, ziravê wan diqete. Gazi Tirkê ku rîziyane dikin, dibêjin: Tiştîkî ji bo Kurdan bêjin, bila dewlet bi ser me ve neyê, lê em ji bibêjin 'Em hene, em li vê derêne'. Belki parsek para me ji bikeve.

Kesî, Kurdistan û doza Kurdan ji destê wan negirtiye. "Eva meydân, eva şeytan." Ev 10-15 sal in, Kurdistan di nav agirekî gumrah de dişuxule. Van camêran teze bi xwe hesiyane. HEP tê damezirandin, evana tune ne, Enstituya Kurdî ava dibe van camêran tune ne. Ji her tiştî tirs û xofa wan heye. Lê belê, salê carekî dicivin ser hev, ji xwe re klamen Kurdistanê dibêjin. Apê Hisoye rehmetî digot: "Bavê min, ew karwan cû, hûn geleki dereng mane".

Pêşî revandin û işkence li wan kirin. Piştî çend rojan cenazeyên wan avêtin binê pirê

# Mazrayê lanet li kontrgerîla barand



Cendekê Serokê İHD'ê Metin Can



Doktor Hasan Kaya berî bê kuştin işkence dîtibû



6 hezar mirov beşdarî cenaze bûn

**Navenda Nûçeyan-** Cenazeyen Serokê Komeleya Mafen Mirovan Av. Metin Can û Doktor Hasan Kaya, bi beşdariya 6 hezar mirovi û bi protestoyen girseyi li Mazrayê (Eleziz) hatin veşartin.

Weke tê zanin, roja 21'ê Sibatê Av. Metin Can û Dr. Hasan Kaya ji aliyê kontrayan ve hatibûne revandin û roja 27'ê Sibatê cendekên wan li binê pira Dinarê ku 15 km nêzi

Dêrsimê ye, hatibûn dîtin. Be-riya ku bêne kuştin di işkence-yeke xedar de derbas bûbûn. Di gewdeyên wan de, birin, derb û cih bi cih ji şewat he-bûn.

Piştî ku ev bûyer hate sehkîrin, li Dêrsimê bi hezaran kes, li ber derê Nexweşxaneya Dêrsimê kom bûn. Esnafen Dêrsimê ji, bi tevayı dikanen xwe girtin. Li ser van protestoyen girseyi, hèzen dewletê

erîşê ser gel kirin û 14 kes xis-tin bin çav.

Piştî ku cenaze anin Maz-rayê ji, ji navçe û gündên cî-ran, bi hezaran kes li Mazrayê kom bûn. Malbatên kuştiyan, bîyar dabûn ku, roja duşemê cenazeyan hildin. Lî hèzen dewletê ji gîrsen gel tîrsîyan û ji bo ku cenaze roja yekşemê bêne rakirin, malbatên Metin Can û Hasan Kaya tehdît kirin. Li ser van tehdîdên polisan ku

digotin: "Em dê cenazeyan bi-revinin", cendekên herdu welatparêzan, bi beşdariya 6 he-zar kesi ve, roja yekşemê hatin binaxkirin. Gîrsen gel bi sloganen: "Bimire Kontr-gerîla" û "Dê Kurdistan bibe gora fa-sizmê" nêziki kilometreyekê meşîyan û cenazayen şehidîn xwe li Goristana Mazrayê veşartin. Li goristanê ji, slogan û axaftin her berdewam bûn. Bi-rayê Dr. Hasan Kaya axaftinek

kir û wiha got: "Ew di riya şe-refê de mirin. Lî yênu ku ew kuştin, dê her roj û bi bêşrefi bimirin".

Di vê navê de, cihê ku Me-tin Can û Hasan Kaya lê hatine kuştin, kilometreyek nêzî qere-qola cendirmeyan e û berikên (gulleyen) ku li ber cendekan hatine dîtin, yê MKE (Karge-ha Çekan a Dewletê) ne. Ev ji dibe nişan ku qatil kontrgerîla ne.

*Li girtîgehê Bûca, Batman, Nevşehir vêga jî*

## Li Ceyhanê greva birçîbûnê

**Navenda Nûçeyan-** Greva birçîbûnê ya ku pêsi li Bûcayê dest pê kir û pêl da Zindana Batman û Nevşehir, vêga ji gihişte Ceyhanê.

Ji ber pest û zilma ku piştî bûyera firarê li zindanan zêde bû, roja 9'ê Sibatê girtiyen Zindana Bûcayê dest bi greva birçîbûnê kiribûn û li dû vê zindanê, ya Batman û Nevşehir jî disa bi greva birçîbûnê destek dan girtiyen Bûcayê û dawi pêla birçîbûnê xwe gihande Zindana Ceyhanê.

İdareye Zindana Bûcayê, be-ri mehekê di nava zindanê de tunelek derxistibû û ji bo vê rewşê zilm û pest li ser girtiyen zêde kiribû. Girti ji, bi mebesta protestokirinê ketibûn greva birçîbûnê. Girtiyen ku vedana tunelê girtine ser xwe ev in: U-nit İlter, Vedat Savaş, Ali Rıza Kurt, Celalettin Ali Güler, Devrim Demir, Teyfik Durdemir û Timur Çelik. Ev kes bi emrê wezareta Edaletê neqlê Zindana Eskişehrê kirin.

Ji 46 girtiyen Bûcayê yêni grevê de, 4 kes ji aliyê sihetê ve di rewşekê xedar de ne.

Ji çavderen komiteya grevê Eviyat Mehmet Yatar û Kemal Bilgiç da xuyakirin ku, Mujdat Yanat zeriki ye û li nexweşxanê tedavikirina wi nehatiye qebül-kirin. Ev ji talükeyeji ji bo gir-

tiyen din, ji ber ku zerik nexweşyekê perok (salgin) e.

24 girtiyen Zindana Batmanê yêni ku 24'ê Sibatê dest bi grevê kiribûn, hîna greva wan didome. Ji vê zindanê ji idareyê, 6 girtiyen grevvan şandin Zindana Elezizê.

Girtiyen Zindana Batmanê dan xuyakirin ku, heta pest û zordariya idareyê hebe, wê liv-baziya wan dewam bike.

Ji bo destekdayina girtiyen zindanen din û protestokirina helwesta rayedaren zindanan li Zindana Ceyhanê ji greveke birçîbûnê dest pê kir.

### LI ZINDANÊN AMED Û MÊRDÎNÊ BERXWEDAN

Li aliyê din nexweşya zerike, di nav girtiyen Zindana Amedê, de ji xwe nişan da. Girtiyen zindana Amedê roja 8'ê Sibatê dest bi grevê kiribûn û hîna vê livbaziye didominin.

Ji ser derketina nexweşina zerikiye, daxuyaniyeke protestoye ji aliyê komele û saziyen demokratik ên Amedê ve hate weşandin. Ev daxuyaniya ku ji aliyê KMM, şubuya 1.a. Yol-ış, Tüm Maliye-Sen, Tüm Ha-ber-Sen, Tüm Ray-Sen, Tüm Sağlık-Sen, Sağlık-Sen û E-ğit-Sen ve hate kirin, bi kurti wiha ye: "Dewlet li aliyeki, dix-

waze gîrsen gel ji beriya Nev-rozê ve bitirsine, ji aliyê din ve ji mafen girtiyen zindanê ji destê wan derdixe.

Em, wek saziyen demokrat ên girseyi vê helwesta dewletê û hemû kîrinen wê yêni li dîji mirovahiyê protesto dîkin û bala raya giştî ya demokrat dîkişinin ser vê rewşê."

Greva li Zindana Mêrdinê ji, bi beşdariya 400 girtiyen didome.

Girtiyen Zindana Mêrdinê yêni ku ji ber neheqî û pesten li wan dibûn, roja 22'ê Sibatê dest bi greva birçîbûnê kîrin, bala raya giştî û saziyen demokrat, bi daxuyaniyeke kişandin ser rewşa zindananen xedar.

## Li Mêrsinê erîşen kontrayan

**Navenda Nûçeyan-** Li metropolen Tirkîyê, cinayet û qirkirinê kont-rigerîla didomin. Li Mêrsinê di rojekî de, 2 welatparêz bi erîşen kontra-yan hatin kuştin.

Erişkar yekemin roja 5.3.1993'an li taxa Gündogdu pêk hat. 3 erişkar, Sadık Bilgin li ber dikana wi bi gulebaranê kuştin û bi motosikletê reviyan. Bi erîşen kontrayan re xelkê li der û dor, bi dû kontrayan dikevin. Di vê navê de yek ji kontrayan demâna xwe dixine. Polisên ku bi ser bûyerê ve tén, dest datinîn ser vê demançê.

Piştî ku bûyer di nav Kurdên li Mêrsinê de hate sehkîrin, bi hezaran kes, li dorhêla mala Sadık Bilgin û nexweşxaneyê kom bûn. Hêzen dewletê, pêsi nexwestin ku cendekê Sadık Bilgin bidin. Dû re rêvî birîn HEP'a Mêrsinê li cihê bûyerê lêkolîn kîrin û hatin nexweşxaneyê. Cenazê Sadık Bilgin li Tarsusê li goristana Eshabulkeyfê hate veşartin.

Dema ku cenazê Sadık Bilgin li malê dihate şûstîn, vêca li taxa Demirtaş, gundiye Sadık Bilgin, Abdulkerim Baltekin ji aliyê 3 kesan ve hate kuştin. Yek ji erîşkaran ji aliyê gel ve hate girtin û linçkirin. Li ser vê yekê, herdûyen din, bi ser gel ve agir (berek) reşandin, lê gel bi dû wan ji ket û ev herdu kes bi motosikletekê reviyan. Di vê navê de, polis erîşkarê ku ji aliyê gel ve hatibû girtin ji destê xelkê xelas dike û dibe nexweşxaneyê. Navê vi erîşkarî Abdülecelîl Akyüz e û 16 sali ye.

Tê gotin ku Sadık Bilgin û Abdulkerim Baltekin ji ji aliyê eyni kesan ve hatine kuştin. Li gor agahiyen dawi ketin destê me, Kurdên ku ji bo cenazeyan civiyane, ji aliyê polisan ve hatine dörpêçkirin. Li taxen ku bi pirrani Kurd lê dijin ji, esnafan kepengen xwe girtine û protestoyen giring pêk tén.

## 'Bila ev infazên bêmehkeme bisekinin'

**Navenda Nûçeyan-** Sendiqaya Karkeren Petrol-İş, infazên bêmehkeme û cinayetên faili meç-hûl bi daxuyaniyeke protesto kîrin.

Ji ber kuştina çar mirovén welatparêz û parêz-vanen mafen mirovan, li ser navê Heyeta Kargeriya Navenda Petrol-İş, Sekreterê Giştî Bayram Yıldırım, belavokek şand ji çapemeniyê re. Belavok bi kurti wiha ye: "Hêzennm me yêni demokrasiye, di riya parastina mafen mirovan de çar neferen xwe yêni din ji winda kîrin.

Serokê ÖZDEP a Erzinganê û endamê KMM Cemal Akar, rojnamevan Kemal Kılıç, Serokê KMM ya Eleziz Metin Can û doktor Hasan Kaya, ji aliyê hêzenn tarî yêni dijminê demokrasiye ve

hatin qetilkirin. Eşâ me giran e. Ev eşâ hemû hêzenn-demokrasiye ye û bi bir û baweriyeke xirt dibêjin ku; wê tékoşina wan bidome, berpirsiyár zû an dereng wê yekcar bêncêzakirin.

Di vê sala dawi de bêhejmar şoreşer û demokrat bêmehkeme hatine qetilkirin. Vêca em dibêjin lazim e zihniyeta gotinên serokwezirê Tirkîyê "Se cinayet ku failen wan meçhûl in, mane" bê rona-hikirin û maneya van gotinan bê teşhîkirin.

Edi tu baweri bi gotinen rayedaren dewletê yêni ku dibêjin "Kontrgerîla li Tirkîyê tunin" nemaye.

Ji bo ku ev rewşa xerab ji holê rabe, lazim e hemû kesen xwe demokrat dihesibinin, seferber bi-bin."

# Bêyî jinan têkoşînên civakî serfiraz nabin

Rûken Baxdû

"Serkeftına şöreş bi giringiya  
beşdarbına jinan ve giredayı ye.  
Temamē teygeren serfiraziyē ev  
rasti nişan dane." (Lenin)

## 8'È ADARÈ Ù KLARA ZETKÎN

**Roja 8'è Adaré.** Ev roj roja hemû jinên dînyayê yên kedkar ku li hember zordesti û zehmetkeşiyê serihildane ye. Di 8'è **Adara** 1857'an de kuçe û kolanen New Yorkê bi dengê jinên kedkar yên tekstile dihejîyan. Dengê xwe ji bo mafen xwe yên gixul û sosyal, şertên sihetê û ji bo këmkirina saetên dema xebatê bilind dikirin. Lê Amerika-ya Militarist ev serihildana wanya biheq bi xwinê fetisand û belav kir. Ew berxwedana jinan ya wê rojê dirokê de bû senzibola serihildana jinan. Di sala 1910'an de, di Enternasyonala Duyemin de bi pêşengiyâ **Klara Zetkin** ji 8'è Adaré bû roja piştgiriya têkoşîna hemû jinên kedkar ên dînyayê. Roja 8'è Adarê ya Jinên Kedkar ber bi dawiya sed sala 19'an ve nirxeke çîna (sinif) karker e. Ji ber vê ji beri mirov rewşa jinan ya iro binirxine divê mirov li beriya wê binêre.

Jin di diroka mîroyahîyê de herdem civata insanan bi pêş xistiye û parastiye. Lewre jin cînseke ku bi tevabi (tevi dom-kirina neslê insanan) mora xwe li hilberîne (üretim) xistiye ye. Di vê pêjöyê de statuya mérän ew e ku këmasiyên civakê dagirin. Rewşa hukmê jinan ya wê demê her çiqas kevnare û paşverûyi be ji gene bê kedxwari (sömurüçü) û bê çini ye. Bi kurtasi jin serwer (egemen) be ji di we demê de bi giştî wekhevîyek te jîvandin.

## DESTPÊKA XERABÚNA REWSA JINÊ

Lé bi şün de rewş diguhere.  
Edi hukim ji destè jinan derbası  
yé mérän dibe. Mér bi hemü  
heza xwe ve dest danî ser hilbe-  
rinê. Bi vê re ji bû sedemj dest-  
pêka diroka ketina jinan, rewşa  
wan ya iro. Bi pêşketina jinan li  
aliveki, qabiliyetên wan yén heyi  
ji tumebüm.

- Jina esir li piş méré esir.
  - Jina gundi li piş méré gun-di.
  - Jina xebarkar di bin zordes-tiva méré xebatkar de.

Dî van her sê pêvajoyan de ji  
hégamonyaya mérân bingeh e.  
Statuya jiné herdem bindesti  
bûye. Çawa jina karker di bin  
zordestiya mérê karker de bûye,  
jina qralice jî di bin tesira qral de  
maye. Lewre jin ji dema sistema

keynare ya komunal û vir ve ne  
tenê ji hegemonyaya xwe ji kesa-  
niya xwe ji mahrum mave.

Di hemü merhaleyên dirokê de ji bo xelaskirin û bîpeşxistina mirovahiyê, di xerakirina tişrîn kevnare û di-afrandina yê nû de herdu cins bi hev re bûne. Lê di van xebatan de herdem rola jinê hatiye jibirkirin: Di dirokê de **Spartakus** heye lê bêjin; **Kawayê Hesinker** mirkutê wi di dest de li hember **Dehaq** c. Lê ne navê jinên Kawa ne ji yê Dehaq têن biranin. Tu dibêjî qey evêñ feodaliteyê perçê wesle dîkin rola jinan li cem xwe ji bîn

dikin. Di her merhayé de xebatén jinan hebüne lé rol ú ke-saniya wan derneketiye pêş. Tu dibêjî qey ji figuraniyê pê ve tiş-teki din nekirie. Lé belê divê evneyê wê maneyê ku jin di turmerhaleyên dirokê -diroka ci-vakê ya bi cini- de derneketiye pêş ú bi kér nehatiye. Na. Hende lê ne bi awayeki wekhev mora xwe li rûpelên dirokê dane.

Mirovahî, di dirokê de leqayî  
gelek navên jinêñ navdar, ne-  
navdar û leheng dibe. Klara  
Zetkin, Roza Luksembûrg,  
Marie Antoniette, Leydiya  
Hesin, Leyla Qasim, Zekîye  
Alkan, Bêrivan, Sâbahat...

Klara Zetkin, Roza Luksemburg, Leyla, Zekiye, ü Bêrivan ji bo asifandina tişteür nû ü delal; Marie Antoniette ü Leydiya Hesin ji, ji bo parêziya sistema heyi xebitine.

Jina ku di zevi û karxaneyand  
de bî mérân re xebitiye divê di  
têkoşina azadiyê de ji, li cem  
mér be. Berê jina ku mal û  
milkê mérân bû iro büye navgi-  
na reklaman. Jina ku doh, di na-  
va eba û çarşefen reş de pêçayî û  
veşarti bû, iro ciheki wê yê neve-  
şarti nemaye. Helbesta jinê, ro-  
mana jinê, resim û sinemaya jinê  
roat bi roj qedera jinê ji, ji alyî  
mérân ve tê nivîsandin û hatîye  
nivîsandin. Jin ku ewçendî hatibe  
daketandin, mér ji nikare ji piya  
bisekine. Lewre cînsa ku zordes-  
ti li ser cînsa din bike ew bixwe  
ji ne azad e! Ji ber vê, riya azad-  
büyîna mirovahiyê di bipêşketi-  
na azadbûna cînsan, têkoşina bi  
hrev re û di parvekirina hemû  
dewlemendivan de derbas dibe.

JINÊN WELATÊ ME

Jin n welat  me... Leyla, Ze-kiye, Rah san, Binev  u B rivan, Kurdistan bi cezb   delalîya xwe herdem dil  biyaniyan li xwe bi-jirandiye. Dayika Dicle u Ferad, xwediya Riya Hevrishim  Kurdishan. Ji p sir en w  s r  petrol  di-herike. Hinek ji ne ji ber van xislet n w  ne ku ewqas t  ta-lankir n, dagirkir n u istilakir n? Welat  Kawa, Hayri, Mazlum,

Egit, Kemal ú Apê Musa iro di  
bin èrişen dijminên xwinxwar de  
dinale. Ne tenê bixwe tevî in-  
sanen wê ji dixwaze bê tunekirin  
dayika beşeriyê. Ev welatê ku  
mîrên wê lal, kerr ú kor hatiye  
hiştin em nizanîn wê jinên wê  
çawa bin? İslgal, istila ú talanki-  
rin têra jîna Kurd nekiriye ica-  
ketiye bin zordestiya mîrê xwe  
yê bê hest ji. Di metropolan de  
ji rewşa jiyana wê mina ku di  
zindanan de be ye. Lal e. Jîna  
Kurd li axa xwe ya ku lê hilberîn  
(üretim) pêk nehatiye li pey-  
mîrê xwe geh li vi aliyî u geh ji  
li wi alivîvî mina sîrgûna jîvave.

## JINA KURD Û TÊKOŞINA NETEWEYÎ

Di pêvajoya dirokê de her ci-

qas jina Kurd li hember istila û dagirkeriye di serhildanan de cih girtibe ji, ji ber ku azadbûna ke-sanetiya wê bi pêş neketiye, nikaribûye rabe ser piyan. Jina Kurdistanê hê di merhaleya rabûna ser çokê de ye. Di vê mijarê de iro réberên wê yên bi hêz hene di riya azadiye ya direjede. Rastiya ku jina Kurd ji vi qalikê wê xelas kir 15 Tabaxa 1984'an e. Ji vê mêmûyê û pê ve jina Kurd bû xwedi hiş û bawerîyeke rast û li hember dost û dijminan xwe ispat kir ku dixwaze besdari tékoşina civakî û netewî bibe.

**Besêya Seyîd Riza** bi awayekî  
nûjen (modern) di tékoşina riz-  
gariva Kurdistanê de li cem-

mérén Kurd têdikoşe. Di serhil-dan-an de, di merasimên cenaze-yan de, di zindan-an de cihê xwe digire jîna Kurd. Ji bo wlatekî nû, ji bo jiyanekê nû û ji bo kesanetiya xwe di têkoşinê de ye ji-na Kurd. Jîna Kurd, hemû pîrs-girék û pîrsa kesanetiya xwe, di azadbiyîna xwe de wê çareser bike.

Heta doh li hember wehşeta dagırkeran xwina kurr û mère wê dirijiya, lê iro xwîna xwe ji dirijine û dibe dirok jîna Kurd. Wê ev tékoşin di dawiyê de bi serkeftina mirovahiyê (jin û mér) biqede. Bêyî jinan tu tékoşmen civaki û neteweyî serfiraz nabin. Her biji bihevrebûna jinên kedkar yén dinyayê û mérän.



Jina Kurd, hemû pîrsîrêk û pîrsa kesanetiya xwe, di azadbûyîna xwe de wê çareser bike. Heta doh li hember wehşeta dagirkeran xwîna kurr û mîrê wê dirîjîya, lê iro xwîna xwe jî dînîfîne û dîbe dirok jişa Kurd.

**Neyîk**




"Serfirazbûyîna jina Kurdistanê  
serfirazbûyîna Kurdistanê ye."

Abdullah Öcalan

# Heta ez birçî bim...

Piştî ku 18 şoreşger û welat-parêz ji Zindana Nevşehirê reviyan, munaqşeyeke xedâr di nava dezge û wezaretê dewleta Tirk de dest pê kir. Xirecireke mezin di nava wezareta edalete (!) û wezareta karê hundirin de hê ji didome. Seyfi Oktay, serekê cendirmeyan, İsmet Sezgin ji wezareta edalete(!) sücedar dike. Ugur Dündar di Show TV de, li ser vê pirsê bi Taner Akçam re dipevive. Akçam behsa reva xwe ya 1976'an dike û weki ku gazincan ji zindanen Tirkîye bike, ku zindan ji revê re pîr musait in. Di vê hevpeyinê de, Akçam tine zimên ku ew ji ber hesreta Tirkîye, di heftê dedu-sê caran li Almanyayê diçê hemamén Tirkan. Ji aliye din ve rojname û kovarên Tirkan ji ber vê büyerê, di "şinê" de ne. Birîna dewletê kûr e, medya Tirkan bêçare û derdê wan giyan e. Gelek ji karmend û berpirsiyaren zindanê hatine girtin. Dewlet ji bo modernkirina(!) zindanan projeyan amade dike û qanûnên nû dixwaze derve. Pispot û zanayên dewletê ditinê xwe dibêjin, ji bo zindanen moderntir pêşniyaran tinin. Li gor wan pirs, pirseki tekniki ye. Heger zindanen wan baş bibûna, cendirmeyen wan li nobetê bibûna, karmendan wan bê hiş nebûna wê ev felaketa reş nehatana serê wan. Helbet ew bêmeyî dikarin wiha bisikirin. Lî bi ya me, pirs ne wiha ye. Ka em vê meseloka xwe bixwinin:

Rojeki xorkeki birçî û betal



li bajareki digere, camereki bani wi dike û ji wî re dibêje:

— Binêre, niha wê mirovîki gelek qelew û stûr (qalin) ji vir derbas bibe, heger tu heri û şırmaqekî li ew hustuyê wî yê stûr bixi, ez dê zêrekî bidim te.

Xort dibêje:

— Wey ser seran, ser çavan, ez çawan lê naxim.

Xort diçê, çiqas jê tê şırmaqekî li hustuyê mîrik dixe. Mîrik vedigere dibêje: "Lawo çîma?" Xort dibêje: "Li min bibore min tu şibandi yekî din."

Mîrik dengê xwe nake, diçê. Xort diçê li ba mirovê xwe û zêrekî xwe digire. Mîrikê zêr dibêje: Heger her cara ku ew mirov ji vir derbas

be û tu şırmaqekî li hustuyê wî bixi, ezê zêrekî didim te."

Husti stûr cara duyemin derbas dibe, xort disa diçê, lê dixe, lê vê carê baz dide. Ú tê zêra xwe ji mirovê xwe digire. Cara sêyemin çaxa ku li hustuyê mîrik dixe, hustû stûr wî digire û dixwaze wî bifetisine, lawik dibêje:

— Tu ci diki bike! Herçî heta ev hustuyê te yê stûr hebe û heta ez ji birçî bim, ez dê li hustuyê te bixim.

İca bila aqlîmend û giregirê dewletê wê yekê baş bizanibin. Heta ev dewlet ewqas zalim be, heta Kurdistan bindest be û heta zindan tije bin reva ji zindanan ji wê dom bike.

## Çend rastiyê civaka Amerîka

... Li Amerikayê 37 milyon kes bësigortaya nexweşiyê ne, di nava hemû welatê Rojava yên industri de, zarok, heri zêde li Amerikayê dimirin, temenê (emrê) insen ji, li Amerika heri kurt e.

Ji sedi 20'ê kesen reşik û yên ku bi İspanyolê qise dikin, di bin standartên asgari (eksistens-mimum) de dijin. Amerika ji aliye nifusê ve %4 ê cihanê ye, lê %50 kokaina cihanê, li Amerika serif dike.

Piştî salen 1960'an, sücdarı li Amerika %355 zêde büye û salê 19.000 kes bi silchê, ku di dikinan de têr firotin, tê kuştin.

Li Amerikayê kuştin 5, bi zorê tecawuzê irzê 7 û şelandina bi çek ji 10 caran ji welatê Rojavayê Ewrûpâyê, zedetir e.

Sistema perwerdehiya Amerikayê, gelek dibistanen luks û enstitütûn lêkolînê, pêşkêsi civakê dike. Lî standartên vasati her sal dikevin. İro heri kêm 25 milyon Amerikanî ne dikare bixwine û ne ji binivisine. Ji aliye zanabûnê ve, telebeyen Amerikanî di testên navneteweyi de, di pêla heri jêr de ne..." (Sverker Sörlin, docentê dirokê ye, niha li Universita Berkley wek lêkolînvanê mîvan kar dike. Ev nivisara jorin ji meqale-

yeke wi hatiye standin. Binêre, Dagens Nyheter, 25.2.1993)

Xuya ye ev istatistikên jorin gelek balkêş in. Meqaleyeka ku Sverker Sörlin nivisandiye, di rojnameyeke çep û anti-imperialist de çap nebiye. Niviskar di vê maqaleyê de; propagandayê nake, lê li ser problemen civakî, sosyal û exlaqî yê civaka Amerikayê radiweste.

Ev istatistikên jorin, rismê Amerikayê yên rastin nişanê me didin. Helbet hemû rastiyê civaka Amerikayê ne ewqas in. Lî heger mirov bixwaze rastiyê bibine ewqas bes e, zêde ye ji.

J. Diyarbekir

## TÎR

Musa Anter



### Malê xezînê

Tebi etekî Tirkan heye. Bê çiqasî bermeqlûb e. Jix-we wek Tirkan milet tune ye, mal û milk hemû yê dewletê ye. Yanî yê xezînê ye. Xezîna Tirkan ji weke ya miletê medenî ne ji ticareta wan tê dagirtin, tim ji malê feqîr û fiqaran e. Tirk tim miletê dewlemed nav xwe diukjin, berdidin wan ji welatê wan û dû re ji, ji mal û milkên wan re dibêjin malê xezînê. Wek Ermenî, Rûm û Kurdan. Di zarokatiya xwe de min mekteba pêşî li Mêrdînê xwend. Mekteba me mala filehê Kendîr bû, temamê wan kuştin û qesir û qonaxê wan ji kiribûn malê xezînê û ji me re kiribûn mekteb. Mala Kespo ji giş qelândibûn û qesra wan ji kiribûn malê xezînê û memleket xestxanesi (nexweşxane). Sê mekteben din ji, li Mêrdînê hebûn ew ji giş qesir û qonaxê filehê kuştî bûn. Ev ên Mêrdînê. İca li derive iro nîvê Kurdistanê malê xezînê ye, yanî giş yê kuştîyên Suryanî, Ermenî û Kurdan e. Mesela iro Ceylanpinar Çiftliği yanî Rasileyayan bi Kurdi Serêkaniyê malê Birehîm Paşayê Milî bû. Birehîm Paşa kuştin, zarokên wî reviyan cûn Sûriyê û ew ji bû malê xezînê. İro dibêjin Çiftlikâ Serêkaniyê li dinyayê ya pêncan e. Gotineke Cegerxwîn yê xweş heye, dibêje: "Welatê me tev ziv û zêr e, lê ma em ci bikin maye ji xelkê re." İste malê me ji, bi vî awayî giş büye malê xezînê.

Bi şerîetê ibadet û imamtî bi pereyan guneh e. İca tewer dîndarên Tirkîye guneh li ser guneh dikin. Ma ne ev pereyên heram ên xezînê dikevin butçê û reisê me yê dîn hezretlerî ji, ji wê butçê wekî xwîna xenzîr meeşê distînin.

Bi şerîetê ibadet û imamtî bi pereyan guneh e. İca tewer dîndarên Tirkîye guneh li ser guneh dikin. Ma ne ev pereyên heram ên xezînê dikevin butçê û reisê me yê dîn hezretlerî ji, ji wê butçê wekî xwîna xenzîr meeşê distînin. Meselek ji van hat serê min. Di 1954'an de ez çum Qulpê, malek Ermenî kuştibûn, du zarokên wan filitibûn, bûbûn musulman lê temamê milkê wan giş kiribûn malê xezînê. Rebena derdê xwe ji min re got min ji, ji mebûsê Diyarbekir Mustafa Ekîncî û Azîzoğlu re got. Sê salan xebitîn heta ku me milkê bav û kalên wan resmen ji xezînê stand. Carekê cewabeke wiha dabûn me, mudurê xezînê digot: "Efendim ev malê filehan e, ewê ku niha dawe dikin musulman in. Ma emê çawa malê filehan bidin musulman?"

İro bi milyonan koçanên tapoyê di destê Ermenî û Suryanîji derve de ne. Rebena dawe dikin em dibêjin: "Na yabo me tu fileh ne kuştine ew dibêjin erê heyran wekî we em ne kuştine û em ne ji Tirkîye ne, ma ev ci qoçanên me ne?" Ku dinya vê qebûl dike zirzopa hikûmeta me dibêje dinya hemû dijiminê me ye.

Ê ma lawo we xelk kuştine mal hû milkê wan zept kirene, ma wê kî ji we re bê rehme li dê û bavê we. Hema iro ka em li Qibrîs binêrin. Berî zeptkirina Qibrîs 40-50 hezar musulmanen feqîr li Qibrîs hebûn, gişka ji di şuxulê Rûman de dişxulîn. Em cûn me Rûm ji ser cihê wan qewi randin û kuştin me malê wan zept kir otêlên wan, plajen wan, apartmanen wan û çiftlikên wan. İca iro em dibêjin Rûm bi me re li hev nayê. Ê ma keko wê çawa bi we re li hev bê. Hema Gîrne û Maraş besî ne lihevhatina Rûman e.

Divê em dev ji vê wehşeta xwe berdin. Ya na wê tim ev gotinên pêşiyên Tirkan bê pêşîya me: "Ji Tirkan pê ve kes dostê Tirkan tune ye."

Ma lawo Tirkno, bi vî tebîetê we wê kî xweliyê li xwe bike bibe dostê we.

*Dewletê  
ji niha ve  
dest bi  
qetliaman kir*

# Tirsa Newrozê

**Navenda Nûçeyan-** Dewlet, ji tirsa Newrozê di rojén dawî dê erişen xwe yên hovane li hember gelê Kurd zêde dike. Ji bo ku gel bitirse û ejna Newrozê piroz neke timên dewletê eriş ser malan dike, gundan dişewitîne, welat-parêzan digire her cure metodên nemirovahiyê bi kar tine. Li aliyê din, ji bo ku xwe bi hêz û xurt nişan bide di televizyon û rojnameyan de daxuyani û nûçeyen derew diweşine. Dibçe "Me ev çend gerila li vir kuştin, ev çend ji esir girtin û hwd" Bi vi şekli dixwaze gel dilsar bike û ji vêga ve, gerâhiya ejna Newrozê ji holê rabiye.

Erişen tim û kontrayen dewletê yên van rojén dawî dibe ser Nisêbin, Cizir, Mêrsin, Dêrik û gelekk deveren dir û qetlikirina Kurdistan dest vala ji, ve armanea dewletê eşkere dike. Lé tevi hemû hovîtiyê metodên wê yên qirêj, gelê Kurd, bi paş ve gav navîje, li şehidên xwe xwedî derdikeve, hêrsa wî ya li dijî dewletê û dilgermiya wi ya li hember gerila û dilxaziya wi ya pirozkirina ejna Newrozê, tim û tim zêde dike.

Li aliyê din Nûneriya ERNK'ê ya Ewrûpa, ji bo ku gelê Kurd bi zanebûn û tebdîr ve Newrozê piroz bike û nekeve çewti û xelitiyê berê û ji wan ders bigire, mesajek ji gelê Kurd re şand.

Ji bo ku gelê Kurd neyê provakasyonê dewletê û neyê xapandin û rewşa xelkê li cih bibin û wan guhdari bikin, mebusen HEP'ê ji li Kurdistanê di gerin.

## LI NISÊBÎNÊ QETLİAM

Li Nisêbinê, li taxa Kişlayê, timên taybeti, bi bombeyan erişi ser malekê kîrin û 8 kesi dikujin. Ji kuştian en ku naven wan şesbit bûne ev in: Latif Deniz, Gurbet Deniz, Fethullah Akalin, Süleyman Kaplan û Şemsettin Evşin.

Li gor agahiyân roja 4.3. 1993'an ber bi êvarê ve, timên taybeti, bi bombeyan erişi ser malekê dikin û 8 kesi dikujin. Ji kuştian en ku naven wan şesbit bûne ev in: Latif Deniz, Gurbet Deniz, Fethullah Akalin, Süleyman Kaplan û Şemsettin Evşin.

Ey bûyera ku bi destê timan hatiye kîrin, ji aliyê Walitiya Herêma Rêveberiya Taybeti ve tê berevajikirin û yên kuştî mina "terorist" tene ilankirin.

## DEWLETÊ HERAG ŞEWITAND

Li Licê, hêzên dewletê agir berdan gundeki. Roja 1'ê Sibatê hêzên Komara Tirk girtin ser gundê Heragê û agir berdanê. Di dawiya ve eriş de 4 mal bi temamî şewitîn. Di ve bûyêrê de hin mal ji texrib bûn û heywanen gund ji telef bûn.

Pisti şewitandina gund, 6 gundiyên Heragê hatin girtin, 2 heb ji wan, bi süedariya bi PKK'ê re a-

likari kirine, hê ji di bin çav de ne.

Dewlet, gundiyan Heragê tehdit dike ku dev ji gund berdin û gund vala bimine.

Li aliyê din, li gundê Reşanê ji, hêzên dewletê girtin ser mala M.Şerif (peşnavâwî nehate tesbitkirin) û mala wî serobino kîrin.

## MESAJA ERNK'Ê

Nûneriya ERNK'ê ya Ewrûpa da xuyakirin ku Newroza 93'an bi rengeki gurr û ges li her deveren ku Kurd û welatparêz lê dijin wê bê pirozkirin û ji bo ku pirozi bi serfirazi bê kîrin, her cure tedbir û destek ji aliyê hêzên wan û birêxistin ve ji niha ve hazır in.

## WÊ GERÎLA GEL BIPARÊZE

Der heqê parastina gel de Nûneriya Ewrûpa wiha got: "Hem gelê me, hem ji gerila ji Newroza sala çûyi dersen giring girtin, ji ber ve yekê wê li hember provakasyonan û erişen dijimin tebdîren xwe bistinîn. Wê gerila bi xwe gel biparêze."

Di hevpeyvina ku Ajansa Kurd-Ha bi Nûneriya ERNK'ê ya Ewrûpa re çekiriye de rewşa şerê gerila, Newroza sala 92'an û tekili û tewrên reformist û xayînê Kurd en bi dijimin re, bi awayekî dorfirê hatine nirxandin û li ser Newroza 93'an û tebdîren bêş standin daxuyaniyek hatiye kîrin.

Nûnerê ERNK'ê ye Ewrûpa li ser sala çûyi bi giştî ev nirxandin kîr: "Sala 92'an hem ji bo me, hem ji, ji bo dijimin saleke giring bû.

Ji bo dijimin 92, saleke ber bi pelişinê ve bû. Dijimin ji bo ku

yekecar têk neçe, hemû derfet û imkanen xwe bikaranin. Bi mebesta ku xwe li ser piya bigire, dijimin ji desteka Ewrûpiyan bigirin ta ya reformist û xayînan, ji kontr-gerila, hizbulâh û cerdevanan bigirin ta çapameniya xweferîş istifade kir û bi desteka van hêzân, timen xwe yên taybeti û hêzên xwe yên leşkeri seferber kîrin. Bi metodên hovane û derveyi mirovahiyê, gund şewitandin cerebandina qetliaman kir, welat-parêz û rojnameyan qetilkirin, bi kurti, di şerê xwe yê bi qeydê û hovane de dijimin hemû imkanen xwe bikaranin. Lé dîsa ji né karî rî li ber pêşveçün û példana têkoşîna gelê Kurd bigire.

92, ji bo PKK'ê ji bû saleke pirr giring, ji ber ku di ve salê de PKK di her wari de pêşveçünên pirr mezîn li dar xistin, ne tenê di warê şerê gerila de di hemû waran de gavên pirr giring û hêja avêtin. Di qada navneteweyî de ji imaja Ewrûpa û dînyayê ya der heqê têkoşîna gelê Kurd de guhert.

Ji raya giştî ya dînyayê re, da diyarkirin û bawerkirin ku, tevgîra serxwebûna gelê Kurd a bî pêşengîya PKK'ê didome, ne tevgerek terorist e; bêrevaji, terorist dewleta Tirk û hevkarên wê ne. Bi vi awayî, kes û dewletên ku hefta vêga destek didan dewleta Tirk, nema dikarin wek berê ve desteka xwe bidominin. Ji ber ku neheqî û hovîtiya dewleta Tirk edi bi tu awayî nikare bê veşartîn.

Di Newroza sala 92'yan de, gelê me pirr şehid dan. Dewletê provakasyonan hovane derxistin pêşîya gelê me, lê dîsa ji em dikarin bibêjîn ku, Newroza 92'yan bû cejna berxwedan û egitiyê.

## NEWROZA 93'YAN

Ji bo Newroza sala 93'yan Nûneriya ERNK'ê ya Ewrûpa hêvîyen pirr mezîn anîn zîman û bi kurti wiha got: "Divê Newroza îsal ji piya bê pirozkirin. Hemû gelê Kurd û kesen ku xwe men-sûbê ve têkoşîne dihesibinin, li kîjan parçeyê Kurdistanê bin bila bibin û li ku derê dijin bila bijin lazim e bi hemû qabiliyet û imkanen xwe ve Newrozê piroz bikin û li ser piya, bersîva ejna Newrozê bidin.

Dewlet di ve Newrozê de ji wê dev ji listik û pravakasyonan xwe ber nede.

Ji niha ve, ji bo kîrin û qirêj civin û sempozyuman li dîr dixe. Heyetê ku di bin emrê şerê taybeti û leşkeri ya Tirkîye di ne diçin Kurdistanê, digerjin.

Li aliyê din, dijimin bi reformistên Kurd û Tirk re planan çedike; dixwaze partiyen xwesipêr û dewletparêz bi wan bide avakîrin. Ew giş wê bibin yek û bibêjîn "Bila gel Newrozê piroz bike."

Dema gel rabû ser piya, vêca wê wan bidin ber fişkan û bibêjîn. "Em ci bikin, me ji gel re got cejna xwe piroz bikin, wan rabû seri hilda. Me ji, ji mecbûri, bi vi ren-gî rî li berwan girt."

Lê em bawer in ku, gelê Kurd wê bi zanebûn ve cejnê, ji hemû caran bêhtir wê piroz bike û agirê têkoşîna gelê Kurd wê li her der bilind bike.

Li aliyê din, ihtimal nadîn ku dewletên Ewrûpa ji wek berê bi tolerans nêziki dewleta Tirk bibe. Ji ber ku raya giştî ya Ewrûpa, der heqê têkoşîna Kurdan de bûye xwedî zanîn û ji her tiştî haydar e.

Dî grevîn birçibûnê yên di bin pêşengîya Meclisa Kurd a Nete-

weyi de çebûn, derkete holê ku, raya giştî ya Ewrûpa û gelek parti û saziyên demokratik pirr eleqe nişanî tekoşîna gelê Kurd dide."

Bi kurti, Nûneriya ERNK'ê ya Ewrûpa dide suyakirin ku Newroza sala 93'an wê bi serfirazi derbas bibe û hêvi dike ku gele Kurd, di Newroza îsal de bi hemû hêza xwe, tev bi hev re, bi bir û bawerî, bi tedbir û zanîn ejna xwe piroz bike û agirê têkoşîne her bilind bike.

## GERA HEP'Ê

8 Mebusen Partiya Keda Gel (HEP) û navenda Partiyê dest bi gera Kurdistanê kîrin. Heyeta HEP'ê li Diyarbekirê ji bo raya giştî daxuyaniyek dan, çapemniyê. Di daxuyaniyê de. Alikarê Serokê Giştî ye HEP'ê Hatip Dicle wiha got: "Ji bo li Diyarbekir, Batman, Sîrt û li bajar û navçeyen din û herêm em bi gel re bin û pirsgirêkên ku dijin ji Réxitinê Gürseyî yên Demokratik û ji gel guhdari bikin, em li vir in.

Weke hûn ji dizanîn gelê me 70 sal e ku hatiye inkarkirin. Ü her têkoşîna wê yên bi maf û meşru bi çekan hatiye şikandin. Lé iro çigas di nava jan de be ji dev ji têkoşîne bernade. Hatip Dicle axaftina xwe wisa domand. "Bi navê "heréketa hundirin" gund têne valakirin. Bi hovîti herêm bêinsan dikin. Bi alikarîya dewletê, bi cinayetên meçhûl tê xwestin ku gel bitirse." Hatip Dicle axaftina xwe wisa qedand:

"Ji bo encamén heréketa hundirin em binirxînin û helwesten em bistinîn ji em bi hev re tesbit bikin. Ü ji bo dewlet weke par li diji gelê me qetliaman nikaribe çebike. Di ve gera me de ci ji destê me were ji bo ve emê her xebatê bikin." Heyeta HEP'ê beriya Newrozê wê li gelekk bajarê Kurdistanê bigere.

## RÊXISTINA EFÜYÊ DEMIREL İKAZ KIR

Alikarê Rêxistina Efü ya Navneteweyî Hervê Berger roja 23'ê Sibatê ji Serokwezirê Tirkîye Süleyman Demirel re nameyek sand.

Di nameyê de behsa Newrozên salen çûyi û qetliaman hêzên dewletê yên li hember Kurd, hatiye kîrin.

Hervê Berger, ji bo ku careke din di ejna Newrozê de hêzên dewletê gelê Kurd nekuje û rî li ber pirozkirina Newrozê neyê girtin, bala Demirel dikişine û wi dawetê islahkirina hêzên leşkeri û bikaranina metodên hemdem dike.

Hervê Berger di ve nameyê de dide diyarkirin ku bi hemû bal-dari û haydariye wê çavê wan li ser Newroza sala 93'an be.



Di Newroza 1992'yan de hêzên dewletê erişi ser gel kîrin û nehiştin ku ejna xwe bi dilekî xweş piroz bikin.

## Mêrdîn dikeliye

Gerilayen ARGK'ê, li Qoscerê érişek birin ser maleke kontra. Di vê ériş de, du kes hatin kuştin. Büyer, di 24.02.1993'an de, li derdora saat 21'00 an de li navçeya Mêrdînê Qoscerê (Kızıltepe) qewimi. Hate hinkirin ku bernavkê kontrayê "Berzan" büye. Li ser bûyerê, hèzên dewletê li navçeyê 30 kesi girtin binçav. Kesén ku hatine girtin navên wan nehate tespitkirin.

Ji aliyê din ve, hèzên dewletê li navçeya Nisêbinê dest bi operasyonê şevê kirine û gelek kes girtine binçav.

Operasyon, bi cerdên ser malan pêk têñ.

Li navçeya Şemrexê (Mazıdağı) ji, ev e serê çend rojan e ku hèzên dewletê bi şev çekan dite-qinin. Esnafê Şemrexê ev büyer wiha nirxandin: "Bi destpêkirina meha Remezanê ve, hèzên dewletê dest bi vi karî kirin. Pişti ku em difitirin, ji tırsan em dikevin bodrum û axurên xwe. "Armancı tırsandin û qurifandina gel e."

## 13 tahliye

Daweya Silopi ya 35 kesan ku di navê de Serokê Belediya Silopiyê Levent Tayşun, nûçevanê TRT'ê Sait Çelik û sê notirvanen (bekçiyen), emniyetê hene, di 24.02.1993'an dest pê kir.

Di danişina vekemin de hate ditin ku Serokê Belediya Silopiyê Levent Tayşun, neanibûn. Di vê dozê de, 13 kes hatin berdan û derbarê 12 kesârde ji cezayê idamê tê xwestin.

## Xwendevanê dewletparêz

Li Liseya Fatihê ya Diyarbekir xwendevanê dewletparêz érişî ser sınıfekê kirin. Di dema ériş de, 5 xwendevanen welatparêz birindarbûn, ji birindaran Mehmet Mızrak, bi xedari birindar bû. İdareya Liseyê tu reaksiyon nişanı vê ériş nedâ û bêdeng ma.

*Li Edenê polîs teklîfa ajantiyê li firoşkarên Kurd dike*

# 'Em ji bo pere gelê xwe nafiroşin'

*Yek ji wan bajaren ku Kurd bi nifuseke zede te de bi cih bûne, Edene ye. Ev ji demeke dirêj ve ye ku, polîs û zabityen belediyê, pêkutiyen dijwar li ser Kurdan dimeşinin. Ferqa navçeyen Kurdistanê û taxen Edenê yênu ku Kurd lê dijîn ji hev nemaye.*

**Navenda Nûçeyan-** Kurdênu bi sedemê curbe cur li metropolên Tirkiyê bi cih bûne, ji pêkutî û zilma dewletê xelas nabin. Hêzên dewletê û belediyyeyen van bajaran, bi awayê sistematik bi ser Kurdan ve diçin û dixwazin Kurdan di xelekeke teng de bigirin.

*Yek ji wan bajaren ku Kurd bi nifuseke zede te de bi cih bûne, Edene ye. Ev ji*

demeke dirêj ve ye ku, polîs û zabityen belediyê, pêkutiyen dijwar li ser Kurdan dimeşinin. Ferqa navçeyen Kurdistanê û taxen Edenê yênu ku Kurd lê dijîn ji hev nemaye.

Di van demêni dawî de ji, polîs û zabityen belediyê, li hember firoşkarê seyar ên Kurd listikan amade dîkin. Polisên sivil teklîfa ajantiyê li firoşkarên Kurdin û dibijin, "hûn dê bi

vî awayî zengin bibin!" Bersiva firoşkaran ji vê teklîfe re wiha ye: "Em xwin mij nîn in. Em gelê xwe ji bo pere nafiroşin."

Mebûse Partiya Keda Gel Hatîp Dicle, ji bo panelekeku HEP û SBP bi hev re amade kiribûn, li Edenê bû li ser giliyên firoşkarê seyar beyanek weşand. Hatîp Dicle, di beyana xwe de bi kurtî wiha dibêje: "Komplot û pêkutiyen li hember Kurdan, weke li Kadifekeleya İzmirê, li Edenê ji bu tundi didomin. Ev zilma ku bi pêşekiya belediyen ku girêdahiyê SHP'ê ne û bi desteka hèzên dewletê tene meşan-

din, divê çavé we netirsinin.

Ev politikayekê giştî ye. Biryarêni bi vî rengi, ji Enqerê, ji MGK (Konseye Ewlakariya Neteweyî)'ê dertên. Ji ber vê ji, divê hûn heta dawî li ber xwe bidin."

Li aliyê din, disa li Edenê dilan û dawetên Kurdan tene qedexekirin. Timen Taybeti, li Taxa Dağlıoğlu, bi ser dawetâ Hasan Ağarman ve digirin. Hemû haceten sazbandan, di bin tekerê panzêran de diperçiqin û li sazbandan didin. Polis 6 kesan ji bi xwe re dibin. Li gor agahiyen ku têñ, li van 6 kesan işkenciyen giran hatine kirin.

# Lihevhatina PKK û Hîzbulallah

*"Têgihîstîn kú bi rijandina xwîna gelê Kurd ê bindest, tu feyde nade doza îslamê. Bi derengî be ji, Hîzbulallah bi xwe hesiya ku, di bin kontrola dewletê de ye. Vê rewşê kîfa me ji anî. Ji bo ku bi temamî ji bin kontrola dewletê derkevin, emê her cure imkan û derfetê bidine wan. Ji ber vê yekê, di meha Remezanê de, emê êrişen xwe yênu li hember wan bisekinînin."*

**Navenda Nûçeyan-** Komiteya Navendî ya PKK'ê roja 27'ê Sibatê bi belavokek da xuyakirin ku, şerê di navbera PKK û Hîzbulallah de, hatiye sekinandin. Li gorî vê daxuyaniyê di meha Remezanê de, PKK wê tu érişî nebe ser endamên Rêxistina Hîzbulallah. Berpirsiyaren Rêxistina Hîzbulallah ji, dane diyarkirin ku, ewê ji, dev ji êrişen xwe

berdin.

Di belavoka PKK'ê de, li ser vê rewşa nû ev şirove heye: "Rêxistina Hîzbulallah ku, ji aliyê dewletê ve heta iro weke navgîn hatiye bikaranîn, dawî bi rewşa xwe hesiya û fêm kirin ku, ji aliyê dewletê ve têñ bikaranîn.

Têgihîstîn ku bi rijandina xwîna gelê Kurd ê bindest, tu feyde nade doza îslamê.

Bi derengî be ji, Hîzbulallah bi xwe hesiya ku, di bin kontrola dewletê de ye. Vê rewşê kîfa me ji anî. Ji bo ku bi temamî ji bin kontrola dewletê derkevin, emê her cure imkan û derfetê bidine wan. Ji ber vê yekê, di meha Remezanê de, emê êrişen xwe yênu li hember wan bisekinînin.

Endamên Hîzbulallah ji, eyni wek me dan xuyakirin ku, wê ew ji êrişen xwe bisekinînin.

Di vê rewşa nû de, yanê bi sekinandina érişan, Hîzbulallah û Hîzbi kontra ku pir tevlihev bûne, wê ji hev biqetin û ji hev kifşibin.

Berdewambûna vê rewşa

nû, girêdayî helwesta Hîzbulallah a li hember dewletê ye. Ger ew ji, li hember dewletê şer bikin wê ev rewşa nû bidome. Bê şik, ev pêşveçün wê riheha Cepha Şerî Taybeti xera bike. Ji ber vê ji, ihtimal heye ku, dewlet disa bi destê zilamên xwe hin welat-parêzan bi navê Hîzbulallah an ji, hin dindaran bi navê PKK'ê bide kuştin û bi vî awayî bibe sebebén tahrîkîrina her du aliyan. Em bângî hemû Kurdistaniyan dîkin ku, li hember van tahrîkan hay ji xwe hebin, nêxapin û hewl bidin ku, ev rewşa nû bi meha Remezanê neyê sinorkirin û her berdewam be."

## HEP çapemeniyê dide mehkemê

Serokê HEP'a Stenbolê yê Bajîr Felemez Başboğa, roja 27'ê Sibatê li ser cerd û êrişen dewletê yênu li hember saziyên Kurd, daxuyaniyek da çapemeniyê.

Roja 2'yê Sibatê, dewletê bi awayên hovane girtiye ser MKM'ê, Weşanxaneya Melsa, kovara Özgür Halk û rojnameyên Yeni Ülke û Welat. Di nav van érişan de, gelek mirov hatine girtin û destdanine ser malzemê û dokumanen van saziyên demokrat. Endama Heyeta Kargeriya HEP'ê Besra Eksen û Serokê HEP'a Fatihê Turgut Basunlu, bê sebep hatine girtin. Em raya giştî ji vê helwesta dewletê haydar dîkin û pêşî rojnameya Sabah, hemû çapemeniya burjuwa ji ber nuçeyen wan ên derew û berevajî protesto dîkin. Em didin diyarkirin ku, emê der heqê çapemeniye burjuwa de doza tezminatê vekin."

## Abdullah ÖCALAN

### DİN SORUNUNA DEVRİMÇİ YAKLAŞIM

## DERKET

Navnışana Xwestinê Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5, Kat:3 Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 512 29 17  
Fax: 512 29 16

# PÊNÛS

Amed Tigris



## Îmaja Kurd û Kurdistanê

Dema mirov ji yekê re dibêje, "Ka wêneyek peyayekî Kurd çêbike", ew radihêje pênûsa xwe ú wêneyek belengazekî bi şasik û simbelboq çêdike. Ya jî bibêjî jina Kurd çêbike, dîsa jineke bi kincen dirêj, qetandî yên hefteng çêdike. Zarok jî yekî cilmo, mêşo, piriti, poto û serçav neşûşti li ba berxan, an jî di nav sergînê de dileyîze. Fotograf jî herwiha né. Dema fotografên Kurdistanê li Ewrûpa têr belavkirin, gundekî li serê çiya ku ne rî diçê, ne hişnayî heye. An jî li Deşta Heranê gundê bi kerpiç, bê dar, bê av... bê jiyan. Wiha ziwa ku, ne req û ne beq dikarin lê bijin... Bi keran cot dîkin. Keçik destar dihêrin. Dema mirov li van fotografan mîze dike, dibêje qey Kurd bi tevayî 2000, sal berî Muhemed, na berê Isa heta berî dema Zerdeşt jîn...

**Kes welatê hişk û ziwa dagir nake. Ji bo welatê xizan û wêran, xwîn narjîne. Jixwe dagirker jî, ji bo propagandayê, vê felsefeya edebiya xizanî û perîşaniyê bi kar tînin. Dibêjin, "Herêma Kurdan çiya û kevir e. Ma em ci jê digirin. Heta li ser me bûye barê giran..."**

Wek ku Kurdistan ne cihê şaristaniya (medeniyeta) kevin be. Ne xwedî bajar û cihê dîrokî be. Wek ku Bedenê Amed, Hewlêr û Wanê tune bin. Wek ku mirov nikarine rastê Xirabeyên Dilük, Nisêbin, Bazid, Sîne, Xarpêt û Erze-

romê bê... Wek ku Gola Ûrmîyê, Wanê, Hezarê ne li Kurdistanê bin. Wek ku ciyayê Agirî, Sipanê, Xelatê û Cûdî li wela-teki din bin. Wek ku Gelyê Alîbegê, Binxal, Zozanê Şeref-dînê tune bin. Wek ku li Kerkûk, Batman û li Kolikê bîrên petrolê ziwa bin... Wek ku tu kanê madenê li Kurdistanê tune bin. Wek ku û her bajarekî Kurdistanê jî nîv mîyonî me-zintir û girtir ne bin. Wek qet ronakbîr an jî xwendevanekei Kurd tune be. Bi yek hevokê mirov dikare bibêje ku li vî welati, jiyan û şaristani tune ye. Wek Efrîqayê zilüt û birçi be. Tu şopên şaristaniya kevin li Kurdistanê ne xuya be.

İro %60'ê Kurdan li bajaran dijin. Civaka Kurdî xwenda û zana ye. Civak ji binî ve hate guhertin. Teknik û komînîkas-yonê, gund û bajar kiriye yek. Zanabûn û hişyarbûna nete-veyî, ji bajar ber bi gund ve cû û dîsa ji gund ve vegeriya bajaran.

Baş e, madem ku civaka Kurdî wiha hatiye guhertin, wê demê cîma em Kurd û Kurdistanê wiha xizan û wêran nîşan didin? Bi ya min ev îmaja felsefe û edebiyateke kevin e. Felsefe û edebiya xizanî û rebeniyê ye. Mirov nikare bi felsefe û edebiyata xizanî û perîşaniyê propaganda rizgariya nete-veyî bike. Bi vê felsefe û edebiyatê kesek nagîhê derekê. Jixwe li ser navê çêpîtiya klasîk me xwe bi van metodê propaganda yê xapand. Berevajîyê vê felsefê û edebiyatê, mirov dikare bi xweşbûn û dewlemendiya welatê xwe, doza xwe ya bi mafdar, bi raya giştî ya cîhanê bide nasandin. Dagirker ji ber xweşbûn û dewlemendiyê, Kurdistanê dagir kiri-ne. Ew ji ber ku xwedî li vê dewlemendî û xweşbûnê derkevin hebûna gelê Kurd ûnkar dîkin. Dixwazin têkoşîna gelê Kurdî ya jî bo serxwebûn û azadiyê bişkinin. Kes welatê hişk û ziwa dagir nake. Ji bo welatê xizan û wêran, xwîn narjîne. Jixwe dagirker jî, ji bo propagandayê, vê felsefeya edebiya xizanî û perîşaniyê bi kar tînin. Dibêjin, "Herêma Kurdan çiya û kevir e. Ma em ci jê digirin. Heta li ser me bûye barê giran..." Çend caran Turgut Özal bi xwe got ku, "Em 20 didine vê herêmê, yek jî, jê nagirin. Ma ci feydeya me tê de heye? Heta em jê zerar dibînin..."

Sedemê dagirkirina welatê me xweşbûn û dewlemendiya welatê me ye. Divê em di warê propaganda de jî xweşbûn û dewlemendiya welatê xwe derxin pêş. Li ser axa we-lateki wiha xweş û dewlemendî civaka Kurdî, civakeke modern, demokrat û pêşketiye. Têkoşîn jî, ji bo vî welat û gelî ye. Têkoşîna me, têkoşîneke mafdar û modern e. Divê em xwe ji bin tesîra psîkoloji û propaganda xizanî û nezaniyê rizgar bikin.

# Biwêjêñ Kurdi

## J. Dilovan

Di zimanê Kurdi de, gelek biwêjêñ ku di nav peyvan de derbas dîbin hene. Ev gotin gelek balkes in. Zimanê Kurdi ji aliyê van gotinan ve pirr dewlemend e. Lî di gelek pirtûk û kovaran de, tişteki bala min kişand. Hinek niviskarêne me, "Gotinê Pêşîyan" ú van biwêjêñ Kurdi dikenye tekînî. Li gor nérîna min ew tişteki çewt e. Lewre gotinê pêşîya, ji bo mirov riya qenciyê û rastiyê bibine hatine gotin. Bi kurtasi, şireten bav û kalan in. Lî biwêjêñ Kurdi ji gotinê pêşîyan cuda ne.

Ji bo ku ev tevlihevi neyê domandin, ez dixwazim çend wekakan (mînak) ji biwêjêñ Kurdi binivîsim:

- Agir ji devan dibare: Pirr bi hêrs bûye. Pirr qeheriye:
- Ava bi binik e: Hemî tişten wî (wê) bi dîzi ye.
- Ava bin kayê ye: Hemî tişten xwe bi veşarti dimeşine.
- Ba jî, ji te, baran jî, ji te: Tu halo ji dîki û tu weki din ji dîki.
- Beranê çar gurçik: Pirr egid û mîrxas e.
- Bêvila (poz) te naşewite: Tu ber tişteki nakevi.
- Bi nan û xwê ye: Bi qenciyê zane.
- Bi qeşite: Ji vir here, biteqize.
- Bi jehre pingahiye: Pirr kindar bûye.
- Bi qurûmîkê zimanê min girt: Peyva min bi carêk qut kir.
- Bin şile: Bi súcê xwe zane.
- Bû dizê sola xwe: Bi fîlbaziya xwe hisiya.
- Çavî der e: (Ji bo xort û mîran) Çavê xwe li qizikan digerine.
- Çavê xwe naşikine: Ji kesekî natirse.
- Darikê hewdelê ye: Tevdaniyê dike. Fesadiyê

dike.


- Dest dirêj e: Dizek e dîziyê dike.
- Dest vala ye: Bê çek e (bê sileh e)
- Duv (terri) kire qemci: Ji tîrsa reviya (bazda).
- Ev hevîr wê gelek avê bikişine: Ev mesele wê dom bike.
- Girrê xwe pê dixwerine: Bela xwe tê dike.
- Guhê wî (wê) dilebitin: Pirr jîr e.
- Hebanika xwe weşand: Hemî tiş got.
- Hemî kes di bin rîma wî (wê) re dibore: Hemî kes meznatiya wî (wê) dipejirine.
- Keviran bi ser de gêr dike: Bi zirtan ditirsine.
- Mü jî maran dike: Pirr bi aqil e.
- Ma divê ez bibêjim mast?: Ma tu vê jî fîm na-kî?
- Müyek di vî mastî de heye: Meseleyek li holê heye.
- Serê xwe li min diherikine: Zirtan li min dike.
- Spiya wî (wê) beloq e: Ki çi bîke xuya nake, lê ku wî (wê) kir xuya dike.
- Sisikekê li heft mahseran digerine: Pirr li ser disekine.
- Şekireki bîskene: Bêje. (Kesê ku karê wî li de-rekê nebe û here wir re, tê gotin)
- Şônîkan li dewsê dikute: Ji neqenciya wî (wê) dipeyiye. Zirtan lê dike.
- Şûr simbelan nabirre: Pirr bi tîfra ye.
- Ta bi derziyê vekir: Hemû tiş got.
- Teyiza: Bi bazdan çû.
- Tu çi fûrekî: Tu çi zû hêrs digirî.
- Tu pê li çavé min bike: Tu bi xér hatî.
- Tu li ser dilê min dikeli: Geleki ji te hez di-ki.
- Xwar û péçkan did xwe: Bi rasti nake.
- Xwê dixwe, avê venaxwe: Pirr qeheriye.
- Weke kabê wiç e: Gelek sivik û jêhatiye.

## Çend mînak ji gotinê pêşîyan

- Xalo (xalan) xwarzi rakirin, mamo birazi wîndâ kirin.
- Dirêjê heywanê, qutê şeytanê.
- Heçî yê birincê bixwe, xencerê jî, li xwe digi-re.
- Rasto diristo, xwaro şikesto.
- Qazi got wali "min ji çayê te yê vî ali".
- Diçe cihê xencerê, naçe cihê xeberê.
- Yê diçe masiya, qûna wî şîl dibe.
- Romî neyar in, Osmani marê kor in.
- Kurê jînebiya jê neke tu hêviya.
- Sergo li ser bana nakeve.
- Mezinê me bi tom e, xweli li serê me bi kom e.
- Te girt berne, te berda pey nekeve (dû nekeve).
- Min dît tu nebîne.
- Heçî yê dizane ji xwe dizane, heçî yê nizane ji baqê niska ne.
- Diwaro ji te re dibêjim, bûkê tu guh bîdê.
- Axayê baş dûr pirekên gundiyan dikeve.
- Bira qenciyâ birayı biviya, jîna birayı mehr nedîkir.
- Avê vexwin ji kaniyan, jîna neynin ji biyaniyan.
- Bilbil kirin qefesa zêrîn got ax welat.
- Berxê nér herdemi yê kérê ye.
- Heçî yê serserê xwe rî de naçe, qedrê lingê xwe nizane.
- Bay dikare bist zaroka xwedi bike, lê bist zarok nikarin, bay xwedi bikin.
- Heft xwişka, wefîsîk ji birayı xwe re girê nedîda.

- Serê çiyê şer hene, bînya çiyê rovi hene.
- Roviye beredayi, ji şerîk girêdayî çetir e.
- Jîna bîne ji esliya, avê vexwe ji kaniya.
- Keçen axa, nabin xelata mitirba.
- Kitik (pisik) ne li mal e, navê mişkê Evdirê-man e.
- Kurma darê ne ji darê be, fenaviya darê nîn e.
- Heçî yê neke xeberê mezina, serê wî de tênu stirê bizina.
- Rih dibin bost, neyar nabin dost.
- Bila mirov sed dijminê aqil hebit, ne yek ch-meq.
- Pêncî sala mihaciri, ne salekê neyartî.
- Kaniya mirov avê jê vexwe mirov ji bir nake.
- Piyana mir li erdê ket, ci rast ci vir deng din-yayê gera.
- Heta gotin rovi ye, rovi ye, pişt rovi yê şikest.
- Heger guri paki, ji baranê bikira ji xwe re ku-lavîk çekira.
- Emê iço bêjîn, xwezi li doh.
- Heta rast gera, virê cihê xwe girt.
- Qula aşvanî aş e.
- Bilind nefire, da tu nîvis li erdê nekeve.
- Bitri ji gayê cot re ji nema ye.
- Mîr ketin qumarê, jîn cûn hawarê.
- Gotin ên évara derdi kevin ji qule diwarê.
- Ji berfê spîtr nîn e, sa (küçük) diçe dirî ser.
- Aqil taca zêrîn e, di serê herkesi de nin e.
- Aqil ne jî kiçkayî ye û mezinayî ye.
- Pezê bê şivan ci jê bikim.
- Dîkê bewext bang dide té şerjê kirin.

Berhevirkirin:  
Girina Ciziri û A.Kadir Kasirga



# Edebiyata Kurdê welatê Şêwrê

**ESKERÊ BOYÎK**

Pey tesliqbûna qaydên Sovyetê, ji bo Kurdê Ermenistanê, mecalen riyan pêşveçünê kulturi vebûn. Di sala 1921'i de, bi spartina wezareta komarê ve, Kurdzanê bi eslê xwe Ermeni Lazo / Hakob Kazaryan, li ser himê tipen (herfîn) Ermeni alfabeşa xwe ya "Şems" hazır kir û da weşandin.

Di vê salê de li gelek gundên Kurdan dibistan vebûn. Heta sala 1929'an hem li gundên Kurdê Ermenistanê û hem ji, li nav Kurden bajare Tibilisê de gelek zarokên Kurd bi wê alfabevê hini xwendin û nivisandina zimanê dê (zikmaki) dibûn.

Gelek miletê Şêwreyê, büyük û mezin, wê demê, li ser himê tipen Latinî ji xwe re alfabe saz kîrin. Di sala 1929'an de, wezareta Ermenistanê wezîfe spartin I-sahak Mérâgulov û Erebê Şemo ku, alfabeşa Kurdi ya Latinî hazir kîrin. Wê salê kitêba wan a "Xwe bi Xwe Hinbuna Kurmanci" weşîya. Kursiyen dersdarén Kurd hatin avakîrin. Di sala 1930'yan de, bi alikariya dewletê li Yerivanê (Eriwanê) dest bi çapkirina rojnameya "Riya Teze" bû. Konfîransen Kurdzaniye hatin sazkinin. Hema li ser vê meydanê ji, dest bi sazbûna edebiyata Kurdi ya Sovyetê hate kîrin.

Bi rasti mecalen (derfetén) riya pêşveçünê vebûn. Lê ne kesen zana, kadro yani kesê ku bikaribûna vi bare giran bidan ser milê xwe û bi pêş ve bibirana tune bûn. Meydan vala bû. Mirovân xwenda, bi tiliyan dihatin hesibandin.

Beri Şoreşa Oktobrê (Cotmehê) li gundên Kurdan Zore, elâ Surmeliye (Niha li-Tirkîye) û Qundexsazî elâ Elegezê (niha Riya Teze li Ermenistanê) dibistanen Ûrisi di demeke kin de vebûn.

Ji aliki ve xwendevanen wan pîr nin bûn, ji aliye din ve zarokên dewleti û serekesir xwenda bûn. Di vê demê de ji ber çinîtiye (sinifsalik) derfet (imkan) nedîdan kesen xizan ku tevi wi şixuli bibin.

Qewimandinê di navbera salen 1915 û 1920'an de tu hal di nav gel de nehiştibûn. Dil û hésireñ Kurdi, ji Qersê, Wanê, Ba-zidê û ji qüntaren çiyayê Araratê (Agir) ji ber zîlma Roma Reş reviyabûn û bê cih û stare li Ermenistanê, Gürçistanê û li Adırbecanê (Azerbeycanê) belay bubûn. Gelek el u eşir, emre niy-koçeriye derbas dikirin. Ew gundên Kurdan û li qüntara çiyayen Elegezê diman, di sedsala 19'an de ji şerî Baş-Aparanê de gelek derbeyen giran xwarin. Ji aliye leşkeren Türkân ve hatin qırkirin. Ser, xela û nexwei, tu hal di velkê de nehiştibûn.

Qewl û qanûnen feodalî, zor-

bûna hikumdariya qebili û ruhani hin bêhtir ev kar çetin û dijwartir dikirin.

Sêwixane tiji séwî bûbûn. Di nava sêwîyan de, zarokên Kurd ji kêm nin bûn. Lê ji van zarokan re derfet û imkana swendinê çebû û pişt re, hemû bûn beyreqbirê kultura miletê xwe. Niha Heciyê Cindi, Eminê Evdal, Cerdoyê Gêncô û Casimê Celîl ji vê demê ne.

Kurdê mihacirê welatê Şêwreyê, ji koka ruhaniye qetiya-bûn. Dirok, edebiyat û medeniye ta miletê xwe nizanibûn. Rewşa aboriye giran bû. Ji xênci (bili) zargotinê tu tiş li holê tune bûku, bibuya himê pêşketina kultura miletî.

Di wan salan de, komeke entelijensiya Ermeni ku Kurmanci ji zanibûn, di nava Kurdan de xebata ronakdariye dikirin. Pêsi Erebê Şemo, Ahmedê Mirazî, Elixan Şaginov, Nûrê Polatova, paşê ji

**Edebiyata  
Kurdê Şêwreyê,  
ji Kurdê welêt û  
der heta niha cîma  
maye tarî. Afîran-  
dinêne gelek nivîskaran,  
bi taybeti ji  
yêne paşiyê hêja  
ne ku bibin hebûna  
temamiya milet.**

Heciyê Cindi, Eminê Evdal, Wezirê Nadir, Casimê Celîl, Cerdoyê Gêncô û gelek kesen din giliştin wan.

Di wan deman de, li welatê Şêwreyê himê edebiyata Kurde Şêwreyê hate danin. Di sala 1932'an de pirtûk ên niviskarén Kurdê Şêwreyê ya pêşin, di sala 1934'an de ya duyemin, salek pişt re ji ya sevemin weşîya. Erebê Şemo pirtûka xwe ya bi navê "Şivanê Kurd", di sala 1936'an de ji "Kurdê Elegezê" derxist. Di sala 1936'an de Heciyê Cindi û Eminê Evdal "Folklorâ Kurmanci" weşandin.

Ev rewş hin ji mina qewimandineke mezin di nava Kurdê Şêwreyê de tê hesibandin. Di wan salan de, gelek pirtûkên siyasi, vêndersan, bedewtiye û yêne ku wergerandine zimanê Kurmanci, hanîne weşandin.

Di sala 1937'an de li gundê Kurdan û Elegezê (wê çaxê nehiye bû) şanoya (tiyatroya) Kurdan a dewlete vebû. Gelek niviskarén Ermeni vêne bi nav û deng, li ser himê zargotina Kurdi şano nivisin û derxistin ser dikê (sahneye).

Niviskarén Kurdi û ciwan ji, li dora şanoye civîyan, berheman wergerandin û şanoyen nû nivisi-

sin.

Afirandinê niviskarê wê demê, mina gavdana zarokên nû çebûyi ne. Ew hem ji aliye zimên ve û hem ji, ji aliye teknika nivisaran ve qels in. Rast e di nava hinikan de carna piriskê afirandinê têne holê lê, ew ji bedewnivîsariya esil dûr in.

Cureyekî mayin ji nikaribûn bûbûna. Lewre ew edebiyat li ciheki vala hate afirandin. Niviskarêni ciwan û pêşhehati, hay ji kultura xwe ya miletîye tune bûn. Lewre mirata (mirasa) edebiyata milet a dewlemed, ji wan re nebûbû him. Hin pak bi zimên nizanibûn. Bi cureyê miletî nikaribûn bifikiriyana. Lê bi siyanet gerék e bê gotinê weki wan vala, di demen dijwar de, bi saya şuret û xebatê hin dikaribûn çira edebiyata miletê xwe pêxin û hem ji, ji bo pêşerojê deynin holê.

Wê çawa bûbûya? Rîyekê çawa, wanê bi qudanda, eger siyasya Stalinizm li diji miletê Kurdê Şêwreyê ji nehata hev?

Mecal û imkan ji bo pêşveçûna kultura me ya miletîye vekiribûn, hêdi hêdi hatin dadan (girtin). Gelek zariyên milet û ronakbir di binê navê cuda cuda de, hatin girtin, zêrandin.

Erebê Şemo, girtin û sırguni Sibiryayê kîrin. Heciyê Cindi, Cerdoyê Gêncô, Ahmedê Mirazî girtin, xebatê dan rawestantin. Dibistanen di gundên Kurdan de hemû hatin dadan. Kurdê Adırbecanê, Gürçistanê û hînek ji, ji Ermenistanê sırguni Asyaya Navin kîrin. Rojnameya "Riya Teze" dadan. Alfabeşa Kurdi ya Latinî hate hildan. Tiyatroya Kurdan a li Elegezê ya dewletê, di dema gulyedana wê de hate dadan. Bi gotineke din hemû ürt (cax) ûn kultura Kurdi bi carekê re, ji navê hatin hildan.

Di sala 1945'an de, li ser himê tipen Ûrisi, alfabeşa Kurdi ya Kîrîli ya Heciyê Cindi hate sazkinin û çend pirtûkên dersê hatin weşandin.

Pey mirina Stalin, çawa ji miletê welatê Şêwreyê re, her wisa ji Kurdan re ji derfeta (imkana) pêşveçûnê vebûn. Di sala 1955'an de li Yerivanê disa dest bi weşandina rojnameya "Riya Teze" hate kîrin. Xeberdanen radyoyê vebûn. Li Akademiya Ermenistanê sektora Kurdzaniye vebû. Şaxê Niviskarén Kurdi a li rex Yekitiya Niviskarén Ermenistanê xebatên xwe pêşye birin. Derfet ji bo weşandina Kurdi çebûn.

Vê carê edi meydana xebatê vala nin bû. Pişti vegera sırguniye Erebê Şemo xebatîne mezin hatin kîrin. Heciyê Cindi, Eminê Evdal, Ahmedê Mirazî, Casimê Celîl her wisa ji Qaçaxê Mirad,



Casimê Celîl



Ferîke Üsiv



Heciyê Cindi



Eminê Evdal



Eliyê Ebdilrehman



Karlanê Çaçanî

Üsivê Beko, Eliyê Ebdilrehman, Nado Maximûdov, Miroyê Esed, Xelîl Mûradov û gelêkê din giliştin wan.

Li ser vê govekê, dengê bedewnivîsariye ya esil, li pey sala 1960'an hate bihistin. Bi serê silsileta Şikoyê Hesen, Mîkayîlê Reşid, Ferîke Üsiv, Seîdî İbo, Simoyê Şemo, Karlanê Çaçanî, Rîzalîyê Reşid, Emerîkê Serdar, Wezirê Eşo, Egîte Xudo. Paşê ji, silsileta van xetan, Tosinê Reşid, Çerkezê Reş û Babayê Kelles.

Ji van hînek jê, bi şureta xwe ya niviskariya mezin, hînek ji, bi xebatêzi û zanebûna pirr, riya xwe vekirin. Di nava govika vê edebiyata de, bûn xwediye cengê û her wiha hatin naskirin.

Edebîyata Kurdan a Şêwreyê, bi sericekem û kûrahiya xwe ve, şaxke teze ye di nav edebiyata Kurdan a miletî ya dewlemed de. Rast e, ev dûrî axa bay û kalan afîri. Lê mina coheke zelal hat û van salen dawî gilişte çemê de.

Li vîra xebat gilişte kûrahiya anegor û bilindahiya bedewnivîsariye. Meqaleke wiha büyük mecal ji tune weki hûrgili, temamiya reng û awaz. Kûrahi û sericema vê edebiyata delal divê bê analizkirin û nîrxandin.

Ev mijara (mevzuva) xebateke edebiyatzaniye ya mezin e. Hewceyî légerina pêşekzaniye û objektive kûr e. Heta niha ji aliye edebiyatzaniye ve xebateke wiha nichatiye kîrin. Ezê li ser vê mala afîrinek bisokinim û kemasî û destdanina wê kurt û tomari bi çend aspêkten spesîlik ve bidim xuyin.

Bî mançeyê objektivi, ji bo afîrandina vê edebiyatê çawa hem bêhtir di edebiyata Ermeni û mîleten Şêwreyê de temaya milli tê de hatine xebatîn. Lê di edebiyata me ya salen pêşin de, tuyê

bîbêji ruhê miliyetî tê de tune. Tamsarki ne. Niviskarê şuret, bi xebitandina zargotina me ya dewlemed pîri hindik be ji, tuyê bîbêji hatine hildan. Dema mirov berhemén (afirandinê) wan analiz dike, kûrahiya ruhê mili di wan de nagîhije angor (niha).

Van salen dawî, bi saya komeleyan û partiyen Kurdan ûn li Ewrûpa, ev cihê vala hêdi hêdi tije bû. Rojname, kovar û pirtük ji a liye wan ve hatin weşandin. Pemaya (mirata) edebiyat û mîlenîyieta dewlemed gihande ve parê ji.

Cawa di pareka edebiyata weşatê Şêwreyê de ji, ew kemasî û destdanin hebin, herci ew di edebiyata vî weleti de bû. Pesinandi na tamsarkiya bêruh, bi vûlgare stratejiya şoreşa marksizm-leniñizm, birati û pismamtiya civa kan çekiriye, qelp çem ji gelek niviskaran re bûye sericema, payê afirandinâ wap.

Sênzüra (lînerîna) berge bêruh, vêca li çem me Kurdan, ji aliye serkarê redaksiyon û xebatkarên weşanan ve ziyanke pîr mezin giliştiye pêşveçûna edebiyata me.

Hinan gotine, "şairê" me ye ku, xwediye bi dehan pirtükên qalind in. Lê ji bo xênci "afirandinê" bêtam û bêruh nenivisnin. Bi ser de ji niviskarêni bi şuret birine.

Dema ku edebiyata vê para Kurd bê nîrxandin, divê bi hejmar a pirtükên weşandi mirov nexape. Cimki riya weşandîni ji hinekan re vekir bûn, lê hînek ji nikaribûn bi dehan salan tîstekî büyük ji biweşandana.

Edebîyata Kurden Şêwreyê, ji Kurdê welât û der heta niha cîma maye tarî. Afirandinê gelek niviskaran, bi taybeti ji yêne paşiyê hêja ne ku bibin hebûna temamiya milet.

Apê Úsîr, disa vîne bêne ser pêva xwe ya pêsi. Elik û havalen xwe li hepsa Xerpêtî ci kirin?

Penc sale Elik di hepsé de qedian. Li Hepta Xerpêtî ji kar û bare xwe kir. Rojekê, çaxê ku mehkûman berdidin hewşê hepsé, Elik, Şemûn û xalê wve Hiseynê Ferho dikişine emîşa hewşê. Dibejê: "Her yeki ji we çend keviran bixin berika xwe. Emê bi sun hemû kesi ve bimînin. Pişti ku qerdîyanê devê deri bi tenê ma, emê kevireki li serê wi bixin û baz din." Bê çawa peyvi wilo kirin. Erdê res gitriye. Berf û baran e. Hevdû bi şepirzeyeke mezîn digihînin mal.

Deng bi hemû deran ket ku Elik hatîye. Ji nav hemû eşîra hatîn serdana wi. Elik bû mezînê Eşîra Hevérkan. Hikümetê efuya wi dervîst û dev jê berda.

Elik ji xeyni eşîra Hevérkan destê xwe avete wan eşîren din ji. Kirivati da mala Çeto. Xwarziyeke xwe da mi-reki Botan. Omeri bîba xwe de kişand û qewet ji xwe re çekir.

Hezar zilam bi xwe re kar kir û hate Nisêbinê. Hîn zilamen wi dest avetiñ dikanan. Elik got: "Destê xwe bi xwe bigirin. Qima min navê hûn pistiyan bikin." Wê rojê bû mîhvânê Sîlêman Efendiyê Mala Mecer. Sîlêman Efendi kete bin Elik. Divabû ku gîrgireken Nisêbinê bike bin tumê xwe. Got: "Eli Axa, ev gîrgireken Nisêbinê pîr zengin in. Hîncetekê li wan bike u bêşekê bavêjî ser wan." Elik rabû, şiyande ji tevan re, dane hev. Got: "Geli zilaman, ma Nisêbin ne eşîra me ye? Cîma ji hemû deran velk hatîn serdana min û hûn nehatin? Divê hûn evqas pere bidin. Ev eezavê we?" Roja din, çend zilam gotin: "Eli Axa, ji eşîra te Silwê Hedlê, Keçelkû û Heçî Sîlêman di hepsé de ne. Bê ma ti wan nadi berdan?" Elik rabû şiyande ji Midîre Umûmî re got: "Divê tu van hersê zilaman berdi. "Midîre Umûmî je re got: "Eli Axa ez bîyi emre Mîrdînî mîkarîm berdim. Ez emre berdانا wan binivisim û bişînim Mîrdînî. Sibe vi çaxî ezê wan berdim." Disa zilam wi gotin: "De disa eskeren qîngatî li ber wê hepsé ne. Emê biçin wan bi zore berdim." Elik got: "De herin." Rabûn cûn devê hepsé vekirin. Temamê gîrtiyâr berdan.

Elik xwe kar kiribû ku here cem Derwîse Mehmûdê Mala Miho Teze. Ew destbirakê. Elik e. Pişti ku devê hepsé vekir, veler giha Mîrdînî û Diyarbekirê. Ji herdu bajaran gelek esker hatîn û ketîne qîjî Nisêbinê. Elik ba kire qaymeqan û fermandarê esker got: "Ku tîvingek bîteqe, ezê Nisêbinê bişewitînim." Rabû herdujan ji bi xwe re birin û hate Gündîkê Şexan. Lî wir ew berdan û derbasî Tînatê bu.

Qeymeqam û fermandar vegeryan Nisêbinê. Gîrgireken Nisêbinê dane hev, bi xwe re kirin yek. Esker kişandîne ser Tînatê, Memwê Ehmed, Mala Temo Gewre û Ehmedê Sîlêman ji bi eskerê Tîrkan re hatîne dora Tînatê.

Dem payiz e. Em li mal in. Haya me ji tîstekî min e. Min dit Mehmûdê Esad ji Tînatê hate mala me. Bîst û pêne qantîr û ewqas zilam pê re ne. Got: "Fâsla, ez hatîne ji eskerê Elik re mewija bibim." Her bist û pêne qantîr ji mewijan bar kirin. Ez ji bi wan re, em hatîn Tînatê. Eskerê Elik li serê bana razavi ne. Şest-hetfe zilam ji, li ser bana Mala Mehmûdê Esad in. Eskerê Tîrkan û wan e din bi serê si-behê re dest bi ser kirin. Bi hezaran fişek tene waye li ser bana Mala Mehmûd.

Elik rabû, cîlen xwe li xwe kirin. Saroxan xwe kişandîne piye xwe. Got: "Geli hevalan, ma ne eyb e ku em xwe li ber wan kum bi spi û qîngatîyan bitewînin. Elik û Şemûnê Henê Heydo ketîne benkê binya

## Bi Úsîvê Batê re li ser dîroka eşîren Kurdistanê – (2)

# 'Elîkê Batê bi xencerê hicûmî kozikê kir'



gund û dest bi ser kirin. Şemûn li piya ser dike. Du çawîşê li ser silahen giran kustîn û çekê wan ji ser wan amin. Ketiñ pey tevan heta bi Çalê birin.

Sih û pêne rojan bi vi miqamî ser dewam kir. Zilamén Elik gotin: "Heyra spîyan em xwar in. Bedêla ku em ser bi van re bikin, emê biçin cîhê xwe." Rabûn hatîn cîhê xwe. Lî ji mala Eliyê Remo, heta bigîhe Dermemikan û eşîra me Hevérkan li hemberi me rabûn. Cih ji me re nema. Elik rabû çu Xana Dorika. Hevalê Elik Mihemayê Elo, Emerê Şero û pêne sed zilamén wi ketin Midîhê, gîndê filehan.

Xalê Elik Hiseynê Ferho dije Midyadê cem Mihemed Şerîfe Mala Nehroz. Wi bi xwe re dibê û diçin cem fermandarê esker. Dibejîn: "Elik ji mintiqâ te derketiye, wa ye li Hezexê ye. Emê têra te ji bistîn û bela xwe jê veke." Vedigerin, heftsed zêrê Re-sadi û ciharek tiji mecidî ji Elik disti-nin, ji fermandar re û tînîn.

*Bas e, pişti ku Elîk qels kêt û ji nar esîri rabû ci bi eşîre bat?*

Celebi ji hepsé hate berdan. Temamî esîre bi dahol û zirne hatîn ser-dana wi. Mezînê esîre bû Celebi.

Lî Mizizexê kêt û dawet e û ji hemû deran tîn serdana Celebi. Zilamek tê nîvê govendê dibejê: "Wey birawo, birawo..." Celebi ba dike dibejê: "Kuro di nav ve kafâ ha de ci birawo birawoya te ye?" Zilam dibejê: "Celebiyo, çaxê ku Elik xwe çend kire guhê te seqîta, xof û tîrsa wi kete dileye. De wa ye Dorika, Salîha û Döma-na bi Elik re ketîne Midîhê û fêl û fi-nasan bi me dîkin, ji ber ku em he-valê te ne."

Sibha din Celebi rabû çu Midyadê, cem fermandarê esker. Got: "Va ye Elikê Batê li Xana Dorika di bin guhê, te de ye. Qasi zilamén wi ku bi dewletê re ser kirin ji, di Midîhê de ne. Fermana tevan rabiye û hûn tîstekî ji wan nakin." Fermandar dibejê:

"Jî mintiqâ min derketiye. Ma ezê ci je bikim?" Celebi got: "Naxwe te ber-tîl xwariye. Eze gîliyê te bikim."

Fermandar radibe ji tîrsa xwe şest neferi bi Celebi re kar dike. Celebi ji, Saroxan û Mihemed Silim û sed zilamî bi wan re dişine ser Midîhê. Esker û zilamén Celebi digilîn Basibîrinê û

- *Şev e û tave hîv e. Cîlê Bino spî bûn. Tîving avetiñê. Roviyê wî rijandine erdê. Elik ra-hîste xencerê û hicûmî kozikê kir. Silkê Mehmud û ew paş ketibûn. Lî Miradê Serko û Emoyê Evokî ji Basaqê di kozikê de ne. Çaxê siya Elik da ser kozikê, Emo devê tîvingê da Elik û tegand. Avête erdê. Cawa Elik hate kuştin hevalen wî tevan Midîh berdan.*

- *Roja din laşê Elik bi zik ve li qantirekê kirin û anîne Midyadê. Li nîvê bajêr li çarsingê dan. Sê şev û sê rojan laşê wî di çarsingê de ma. Tava havînê laşê wî xira kir. Fâsla diya wî ba kire Mihemed Şerîfe Mala Nehroz. Bertileke mezîn da fermandarê esker û laşê wî bir li Mizizexê bi cih kir.*

- *Ax birazî.... Ku di vî emri de ji min karibûna niha ezê li serê ciyê di nav wan xorten me yê delali de bûma.*

Emerê Şero û çend hevalen xwe ketin aliye Besta Cehnemê. Silkê Mehmûdê Mala Miçê, Miradê Serko û Behramê kurê Ehmedê Miqdad xwe nézîki diwâre kelihê kirin û dest bi zirta kirin. Wan got belki Emerê Şero bi ser me de were em bîkjûn. Çaxê bavê min Elik dengê zirten wan bîhist, ba kire Silkê Mehmûd got: "Wa Silkê Mehmûd i gurçık reveno, ne tu zirta diki. De ji wir nelebîte va ez hatim." Xwe li deriyê kelihê xist û vekir. Besikê û Bino nikaribûn wi bigirin. Bino ji da ber re. Şev e û tave hîv e. Cîlê Bino spî bûn. Tîving avetiñê. Roviyê wî rijandine erdê. Elik ra-hîste xencerê û hicûmî kozikê kir. Silkê Mehmûd û ew paş ketibûn. Lî Miradê Serko û Emoyê Evokî ji Basaqê di kozikê de ne. Çaxê siya Elik da ser kozikê, Emo devê tîvingê da Elik û tegand. Avête erdê. Cawa Elik hate kuştin hevalen wî tevan Midîh berdan.

De ezê pirseke din ji te bîkim. Di Serbildan a Şex Seid de weke geleç ji eşîren Kurd Haen ji, li hember Şex Seid bi bîkîmîcta Tîrki re cîl stand. Ew ca-na cîbî?

Bira, eşir tev hatîn ser Şex Seid. Hikümetâ Tîrki gîş bi zorê birin. Ha-co ji ne bi xwesîya xwe cü.

Ez ji bi Haco re bûm. Haco cil si-war bi xwe re kar kir û em çûne Diyarbekirê. Tîrkan çekên me yê kevin dane hev û çek û silahen mi dame me. Fermandarê Tîrki, Haco, Bozan Beg û Hirço Axa bi eskeren wan ve şivan-din neqeba Siwerekê û Diyarbekirê. Got: "Eskerê, Şex Seid tîla telefunic qû kirine. Herin cîbîkin. Haco û ew cûn. Ciqas cîdikirin. Eskeren Şex Seid disa diqetandan.

*Eşîren ku hatîbîne ser Şex Seid kîjan biin?*

Ehmed Axayê Ewêni, Behram Begê Mala Sérđin, Bozan Beg, Hirço Axa van zanim...

*Eşîren bi Şex Seid re kîjan biin?*

Cemîle Seyda, Eşîra Zirkan, E-mîre Faro, Eşîra Botan, Eminê Mîko, Mala Hafiz, Eşîra Mistanî, Haydar A-xa ji Tewsalâ. Ev in ûn ku tîne bîra min.

*Eskerîn Tîrka cîgas hebîn?*

Birazi, Tîrki ji ku hebûn? Ku ne ji eşîren Kurdan bûna, me safi kiribû.

*Ku niba bîna, tuyê cîbîna ser Şex Seid?*

Ax birazî.... Ku di vî emri de ji min karibûna niha ezê li serê ciyê di nav wan xorten me yê delali de bûma.

*Edî cîl bî?*

Pişti ku Şex Seid hate xeniqandin û safi bû. Tîrki li temamî Axa û Began vegeryan. En ku ali kiribûn û en ku ali nekiribûn, dest bi wan û kuştinê kir.


Waliyekî Mîrdînê hebû. Pîr ji Haco hez dikir. Got: "Haco Axa, ji xwe re bi derekê de here. Hikümet yeki ji axayan nahcîle. Haco rabû, bi malbata xwe ve derbasî Dirbespiyê bû.

*Apê Úsîr te bi ré herpeyînê em xweş bin kirin. Ew gelki spas dikin.*

Ez bi qurbana we, van xorten bedew bibim...

**Heppeyîn: Jîr Dilovan**

Apê Úsîr beta vir em xweş bin bin.



Tabloyeke Emîne Bora

92 Gulan, 1.5 x 2

*Di pêşangeha Resam Emîne Bora ya yekemîn de*

## Tabloyen xemgîn û îronîk

Murat Ergin

Resam Emîne Bora pêşangeha xwe ya yekemin ya ferdi li Stenbolê, di pêşangehxaneya Belediya Üsküdarê de vekir.

Resam Emîne Bora di sala 1970'an de li Stenbolê li Taxa Üsküdarê hatiye dinê. Heta liseyê ji li Üsküdarê xwendîye. Di sala 1988'an de ket Akademiya Hunerên Delal (Güzel Sanatlar Akademisi) ku girêdayî Universiteya Mimar Sinan e. Di sala 1990'an de, ji Atolye Neşe Erdok mezûn bû. Emîne Bora vêga bi komek hevalen xwe re xebatên xwe yên li ser resimê didomine.

Di pêşangehe de 14 tabloyen ku encamên xebatên 3 salan e, têne pêşangehkirin. Di wêneyen Emîne Bora de, di nava dirok de rewşa mirovan a sôsyal û formasyona wan a psikolojik bi figur û formên cihêreg têne pêşkeşkirin.

Mirovên ku di dema iro de ji xwe re û xwezayê re hariye biyankirin (xeribkirin) di nava rastivekê, mekan û dirêjahiye de tê tegiliştin. Ji ali şekil ve ji, bi deformasyona desenan û bi cih cih ji, bi kenê xwe pêkirin, tişt hatîne diyarkirin.

Di wêneyen Emîne Bora de trajediya mirovahiyê, di nava tabloyan de geh bi xemgini û geh ji bi ironiyekê tê dayin. Di tabloyeke de Hitler dibe qesmer di yeke din de ji, qehremanen çirokan ên ku wan temaşa dikan, gazi rastiya jîyanê dikan.

Emîne Bora bi fikra xwe resa-

meke sosyalist e. Dinyaditina xwe ya sosyalist di wêneyen xwe de ji nişan dide. Bi hunera xwe di refen hunera realist de ye, di qada siyasi de xwe li ba gelê Kurdistanê û têkoşina wê dibine. Emîne Bora beri vê pêşangeha xwe ya ferdi, di MKM'ê de (Nâvenda Çanda Mezopotamya) bi grubek resamén Kurd re besdari pêşangeheke şiriki bûbû.

Bi rasti divê, xwendevanen Welat xêzen (çizgi) Emîne Bora binasın, ji ber ku Emîne Bora di rojnameya Welat de bi navê "Çirri" bi wêneyen xwe rûpelan bireng dikir. Resam Emîna Bora ji bo xebatên Kurdan ên çandî û huneri yên iro, ditinên xwe bi kurtasi wiha tine zimên:

"Ez xebatên MKM baş dibi-nim. Xebatên wan hevala bi dil-

sozi ye, lê li gor ditina min gelek kemasîyen wan hene. Li MKM'ê bi pirrani giraniye didin ser folklorê (komên folklorê) û muzikê, ew ji ne muzikeke akademik e. Di MKM'ê de sê çar heb komên muzikê hene. Ev kom ji xeyni stranbêjiye û besdarbûna şev û dawetan tişteki din nakin. Xebatên akademik nin e.

Edebiyat û resim gîring nabînin. Weke hûn ji dizanin ez ji li MKM'ê besdari pêşangehekê bûbûm. Ez karim li ser resimên wan hevalan bibejim ku di resimên wan de elemanen bingehin tune ne. Weke reng, desen, naverok, kompozisyon û hwd. Di resimên Kurdi de populizmeka sifit tê xuyakirin. Dilsoziyekê ku estetikê deformé dike heye. Kemasîyen akademik hene."



92 Kanûn, 2 x 2.45

## AZADÎ



Abdurrahman Durre

### Eşref Bîtlîs û Hosta Necar

Dibêjin ku di wextekî de, bi navê Hosta Necar mirovekî gelek durust û dilpaqîj hebûye. Hostayê daran bûye û dolaban (mobilya) çêdir. Jineke wî yê pir bedew û pirr jî bi namûs hebûye. Fermandarê demê (padîşahê zeman) pirr xedar, bê wijdan û tolaz bûye. Çav berdaye ji na Hosta Necar. Xwestiye ku Hosta Necar bide kuştin û jina wî ji xwe re bîne. Difikire ku bi fend, hîle û planeke wilo bide kuştin ku tu kes jê loman jî neke.

Ji Hosta Necar re ferman dike ku di heftiyekê de, ji hestiyê filan dolabeke pirr rind ji koşk û seraya wî re, çêbike û bîne. Ger heta wê rojê temam neke û neyne, dê serê wî jêbike. Hosta Necarê belengaz, difikire ku ew dolaba paşa dixwaze ne di heftiyekê de, di çend mehan de, bi zor an çêdibe an jî çenabe. Divê ku çend mehan li pey hestiyê filan bigere, ku bi dest xist, çend mehan jî hostatiya wê bike, paşî hê temam bibe.

**Eşref Bîtlîs Paşa jî, weke wî paşayê xedar û zalim planen xwe amade kiribûn. Ger biçûya Kurdistanê, dê gelê Kurd, gund û bajar, cih û war bombe bikira. Xwedê pêşıya wî girt û firoka wî xist, parce parce bûn û mejiyê wan di pozê wan re hatin. An cemed û bûz jî bûne gerîla, an jî sabotaj bû.**

Hosta Necar diheyire, şâş û mat dîmîne. Tu tişt ji, ji destê wî nayê. Disekine, heta ku heftiyâ wî temam bibe û paşa celadên xwe bişîne û serê wî bide jêkirin.

Şeva dawî ye. Xewa wî nayê û gazî Xwedê dike. Jina wî jê re dibêje: "Hosta Necar, razê weke hercar Xwedê yek e dergeh hezar". Şev derbas dibe, şefeq lê dixe, bala xwe didê ku, yek li derî dide. Hosta Necar ji jina xwe re dibêje: "Heqê xwe helal bike, ev celadên paşê ne hatine, dê min bibin û bikujin". Hosta Necar dipirse: "Ew kî ne"? Dibêjin: "Hosta Necar, zû rabe ser xwe, padîşah işev mir, ecele tabûtekerind jê re çêbike". Hosta Necar dibêje: "Ser çavê min". Radibe ser xwe û gotina jina xwe tekrar dike: "Hosta Necar, razê weke hercar Xwedê yek e, dergeh hezar". Şikir ji Xwedê re dikan, şayî dikeve mala wan, şîn û girîn dikeve mala paşê.

Eşref Bîtlîs Paşa jî, weke wî paşayê xedar û zalim planen xwe amade kiribûn. Ger biçûya Kurdistanê, dê gelê Kurd, gund û bajar, cih û war bombe bikira. Xwedê pêşıya wî girt û firoka wî xist, parce parce bûn û mejiyê wan di pozê wan re hatin. An cemed û bûz jî bûne gerîla, an jî sabotaj bû.

Wilo xuya dike ku, Xwedê jî, êdî alîkariya Kurdan dike, lewre mezlûm in. Xwedê jî, terafdarê mezlûman e û li dijî zaliman e. Di Qurana Xwedê de wiha dibêje: "Dê zalim bibînin ku çawa li ser serî li erdê dikevin". Bi rastî ji wilo bû.

Divê ku hemû zalim û faşist, ji vê yekê pirr ders û ibretan bigirin û fêm bikin. "Zilma zaliman hebe, ahê mezlûman heye". Xwedê heq e, alîkarê heqiyê ye û li dijî neheqî û zilmê ye.

# 8'ê Adarê jin û têkoşîn

## Î. Xort

8'ê Adarê, roja jinan tê hesibandin. Ji 365 rojan rojek! Li gorî vê teqwime, 364 roj ji, ji mérän re dimine. Bi navkirina rojan, li ser navê cinsiyetê, bi xwe ji destpêkê xelet e. Lê xeletin hene ku di nava xwe de rastiyê ji dihebi-nin (dihewinin). Weke 8'ê Adarê. Ger li ciheki serdestî û bindes-ti hebe, li wê neverê, zilm û zor ji heye. Ev zilm û zor, ne tenê li ser cinsiyetekê, li ser hemû cinsan e. Bes, ji kûritya dîrokê û ji hinek sedemên taybeti (weke qelsitiya bedeni, fizyolojîki) zilm û zor li ser jinan hin bêhtir zede bûye. Beri her tiştî, divê jin ji, mér ji, kok û sedemên vê zilmê baş bibinîn. Heke baş neyê ditin, jin û mér, wê neyarti-ya hevîdu bikin (weke feministan). Ex neyarti ji, wê bi keri çi-na serdest bê.

Rojen taybeti yên bî navkirî, ger bi keri çin û gelên bindest bêñ helbet divê, mirov wan bi kar bine. Ev rojen wilo ji, bi pîr-rani ji bo tevgirêdan û ji bo bûna hêzék konevâni bê xebi-tandin, wê wateya (mana) xwe bibine û ne ew roj tenê, her roj wê bibe weke wê roj.

Rojen xuya, di jiyana gelan de ciheki gîring digirin. Hin, ji wan rojan re dibêjin cejn, hin dibêjin salveger, hin dibêjin hezini (şû-ni) û hwd. Ji van rojan re, ci tê gotin bila bê gotin, her roj bi xwe re tovén pêşerojê diavêje. Yan bi başi û yan ji, bi xerabi. Başi yan nebaşa van tovan, di desten mirovén ku iroyin didin de ne. Ger mirov bixwaze, kare van tovan bike tovén jiyaneke



*Ger li ciheki serdestî û bindes-ti hebe, li wê neverê, zilm û zor ji heye. Ev zilm û zor, ne tenê li ser cinsiyetekê, li ser hemû cinsan e.*

baş û nû.

Ev tovén hanê, li welatên bindes-hin bêhtir teyli nebaşî, kevir, zixur û striyan bûne. Li gorî vê, divê mirov, tovén başiyê baş bineqine û biçine ku berhemên

pêşerojê bi ber be!

İro li welatê me, her roj bi têkoşînê bûye rojek taybeti. Di nava wan rojen ku bûne taybeti ji, rojen jinêndî Kurd, ne hindik in. Jinêndî Kurd bi têkoşînê re ve-

cinqi û hate ser hişê xwe. Dît ku pirsgirêk, ne tenê ya jinan û ne tenê ya mérän e. Ne ya cinseki ye. Ya hemû mirovan e.

Li welateki bi her awayî, li paşmayî, rola jinan wê di têko-

## Ji bo 8'ê Adarê banga YJWK'ê

YJWK (Yekitiya Jinêndî Welatparêz-ên Kurdistanê) ji bo pirozkirina 8'ê Adarê, Roja Jinêndî Kedkar ên Dinyayê gazi hemû jinêndî welatparêz-ên Kurd dike.

Ji bo pirozkirinê daxwazên xwe wiha tine zimên: "8'ê Adarê ji bo jina Kurd, bi berxwedanê azadbûyin e û bî azadbûyinê ji delalbûyin e. Di vi şerê bi qirêj de awayê têkoşînê ne tenê ew e ku mirov rahêje çek û derkeve serê çiya-yen. Di vi şerê serfirayıde de divê li her derê û

bi her awayî mirov têbikoşe. Mesela jinêndî Kurdistani yên ku li Ewrûpa dijin karin boykot û serdanan (ziyaretan) çebikin û meşan li dar bin-xin.


Karin qadêن mitingan, bi alên rengo rengo bixemilinin û bala raya giştî ya dînyayê bikişînin ser vi şerê li Kurdistanê yê bi qirêj. Li hember vi şerê bi qirêj em hemû bi hev re besdari berxwedanê bibin û ji bo Kurdistaneke serfiraz, azad û hevgirtî bixebeitin."

## XACEPIRS

**Ceparast:** 1-Helbestvanekî ciwan û bi nav û deng. Ji Kobana Sûri ye. Niha ji ber nameyekê di girtigêde ye. Di wêne de tê ditin/Tarix, meyû 2-Sembola Iridyûmî/Cureyek sanoye (tiyatroye) ya ku mirinê an ji rewşen verab û xemgîn ji xwe re dike babet 3-Qad, meydan, rast/Hiri/Yek ji kuren Nuh Pêxember 4-Gazi, dengkirin/Firaqek ku bi keri birin û anina xwarinê tê 5-Dî notayê de dema sekne/Nave, rexistina Neonaziyen Almania 6-Miçe, emeg, hewldan/E ku rojî na-gire 7-Kozir, xweliya eger/Qertafa pirrehej-mariya lêkera 'bûn' 8-Zimanê Ermeniya 9-Pirbêj, teqâ, yê kûn gotinê vala dike/Sembola Osmiûmî 10-Herdu bêdengen di peyva 'azîne' de/Kinnivisina rexistina ïrlandi

**Serejêr:** 1-Dêvok, sive/ Amûreke muzikê 2-Nijad/ Efser, serok 3-Bî zimanê Farisi 'av'/ Muhakeme 4-Bêhtirin ji klamên dilanê re tê gotin, xwedi form, qaide û ritim e/ Kinnivisina rexistina Sandinistan (Nikaragua) 5-Cih, war/ Fêde/ Di Yewnana qedim de navê ilaheyek 6-Folklor 7-Daçekêk/ E mafê keda yekî din nizanîbe û inkar bike 8-Aşê dest/ Pêxemberê silchân 9-Cejn/Cinavka kesani ya yekemin, yekehejmar 10-Mezinê ci-vatê, yê li gotina wi tê guhdarikirin 11-Yekemîn 12-Tele, dafik, faq

## Amadekar: Rasto Zilanî



### BERSIVA XACEPIRSA HEFTIYA ÇÜYÎ

**Ceparast:** 1-Eliyê Ünis/ Ea 2-Domandin/ Erş 3-Ereq/ Kr/ Anku 4-Birübawerî 5-În/ Tirali/ Re 6-Sine 7-Abone/ Am 8-Temami 9-Yeltsin 10-Etna/ Art  
**Serejêr:** 1-Edebiyat 2-Lorin/ Beyt 3-Îmar/ Romen 4-Yaqût/ Nala 5-Ên/ Bisemt 6-Üdkarı/ Isa 7-Nirwana/ Ir 8-În/ Element 9-Ari 10-Eni 11-Erk 12-Aşure

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

**Nav:**

**Paşnav:**

**Navnîşan:**

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derive:** Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

**Li Tirkîyê:** 385393

Ji kerema xwe re vi cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Başmusahip Sok. Talas Han 16

Kat:3 No:301 Cağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

**Mercen abonetiyê:**

Li hundir

6 meh 120.000

12 meh 240.000

Li derive

60 DM

120 DM

şinê de hin bêhtir be. Ji ber ku jin, bê çawa çina (sinif) karker li welatê kapitalist nûnere şoreşye, bela ku hew kes jê bindestir heye, jinêndî Kurd ji, li welatê xwe zîlma-cinsî, çinî û neteweyî lê dibê. Ji bo ku ewqas zîlm lê dibê em dikarin vê bi reheti bibêjin; Jinêndî Kurd mifta şoreşâ Kurdistânê ne. Û bi her awayî divê li pêşîya refen şoreşê cih bigire. Xelasîya jinan, incax bî xelasîya welatê wan ve dé çêbibe.


Jinêndî Kurd, divê şoreşê baş fêr bibin. Çima ku, şoreşâ mezin, wê ya wan be! Mérén Kurd wê têkoşîna du tiştan (çinî û neteweyî) bikin, lê jinêndî Kurd, wê têkoşînê sê tiştan (çinî, çinî û neteweyî) bikin. Û di vê têkoşînê de em baş dizanîn ku barê jinan hin bêhtir giran e. Zengara hezar salan, ji mejîyê mirovan wilo zû bi zû dernakeve. Di nava hêzên şoreşgerên ku ji xwe re dibêjin em bi çaveki wekhvî li jinan dinêrin ji, di pratika xwe de ne durust in! Gelek caran jinan û tevgerên wan biçûk dibin. Bi vê ji qîma xwe naynî! Di nava têkoşînê de jinan, ji xwe re weke bar dibin!

Em li diji van ditinan, divê bi her awayî rawestin. 8'ê Adarê, wateya rojen taybeti û cihê din di nava civaki de bidin fêrkirin. Bindes-ti ne qedera jinan û ne ji qedera gelan e ku bidome. Wê bê guherin û emê biguhetin. Jinêndî Kurd û yên dinê kevirek bingehî, yê jiyana civaki ne. Xelasîya jinan, bi civakê re ye. Jin di şoreşan de, çiqas cih bigire wê ewqasi ji, zû xelas bibin.

U jinêndî Kurd wê bi azadiya welêt re karibin azad bijin!


*Cîrokên Beqan*

# Beqê beqlîsokê were ser derencokê




Gundek hebû li ber devê golekê bû. Di vê golê de gelek hewwanen avî dijîyan. Weke req, beq û cure bi cure masî. Mêrikek ji vî gundi dilê wî ketibû çavê beqekê. Sebra wî bêyî dîtina beqê nedihat. Her roj berî here ser karê xwe, dihat ber devê golê û gazî beqa xwe dikir. Beq jî hînî dengê wî bûbû gava ku dibihîst ew e, xwe ji avê hildiavêt û dihat ji hember wî disekinî. Mêrik berî beq derê ser rûyê avê wiha gazî wê dikir: "Beqê beqlîsokê/ Were ser derencokê/ Te ra-

mûsim çav belekokê." Gava mîrik wisa gazî beqê dikir; beq jî dihat ser derencokê û mîrik çavên wê maçî dikir. Halê vî mîrikî û beqê her roj wiha bû. Rojekê jîna mîrik kete şikan. Bi xwe jî gelekî hesûd bû. Jî xwe re fikirî got, "Ka



ev mîrik her sibe wisa zû bi kîjan aliyî ve diçe?" Rojekê wê ew taqîb kir, dît ku diçe ser golê û bi beqê re mijûl dibe. Pişti ku çavê wê maçî dike, hê diçe ser karê xwe. Jî xwe re got, "Bi Xwedê ev wisa na-be. Her roj û her roj ev ci

hal e?" Ji xwe re ket xem û xeyalan ka bê çawa kare mîrê xwe ji vê beqê bi dûr bixe. Dotira rojê hazırliya xwe kir û berî mîrê xwe serê sibê zû rabû û kete ser riya golê. Mîna mîrê xwe hate li ber pêplûkê rûnişt û bi dengekî muzîkî gazî beqê kir got, "Beqê beqlîsokê/ Were ser derencokê/ Te ramûsim çav belekokê." Beqa min û te weke her carê xwe ji avê hilavêt û hat ser derencokê sekinnî. Jinik çawa çav bi beqê ket hema zûzûka şûjinekê ji berîka xwe derxist û di çavê beqê



de çekand. Beqa reben ji çavekî kor bû û ji ber êşa çavê wê dîlê wê jan da, tevî xwînê xwe berî avê da. Ji ber êşa çavê xwe di avê de ha bi vî aliyî û ha bi wî aliyî ve çû û hat. Paşî mîrik ji xew şiyar bû û mîna her roj hate ber golê. Bi dengekî bilind gazî beqê kir got, "Beqê beqlîsokê/ Were ser de-

rencokê/ Te ramûsim çav belekokê." Beq rabbû derket, lê gelekî bi hêrs bû. Berê xwe da mîrik û got "De here/ Seyê hende mende/ Jîna te dêlika nava gund e/ Şûjin kiriye çavê min de." Û êdî xeyidî û çû. Mîrik çiqas gazî û hêvî kir ji beqê lê beq ji wê rojê û pê ve, careke din derneket ser rûyê avê.

## Bûk mirrr, bûk mirrr...

Beqeke ji devera Kîka dilê xwe xist beqeke ji Newaladalê. Çû ew ji xwe ré xwest û daweta xwe kirin û bûkê birin. Pişti ku pazde rojên bûkê qediya, rabû çû zehiyê (malbavana). Bûk li wê derê nexweş ket. Û mir. Pazdê wê qediya û mîrê wê hate dû wê ku wê bibe malê. Malbavanê bûkê bi xémginî gazî mîrê wê kirin gotin, "Newirrr, newirrr (yanî neyê) newirrr." Ewî got "Çirrr, çirrr, çirrr (çira)" Ewana gotin "Bûk mirrr, bûk mirrr, bûk mirrr (yanî bûk mir). Wî jî got, "Kengirrr, kengirrr, kengirrr (ken-gê)?" Gotin "Pêr mirrr, pêr mirrr, pêr mirrr." Dilê wî eşîya û got, "Heyfirrr, heyfirrr, heyfirrr (heyfê)" û vegeriya malê.

## Çivîka bêbext

min." Pîrê hey got: "Eman zeman, ez pîr im qeweta min nagihîje, ez nikarim cereke din nan lê bixim."

Kir ne kir çivîk ji ya xwe nehat xwarê. Pîrê bê çare rabû nanê xwe, tevde da çivîkê. Çivîkê rahişte nan û çû. Bi rî de leqayî şivanekî bû. Şivan ji xwe re şîr dotîye kasê ku vexwe. Çivîk hat balê got. "Şivan! Tu çîma şîrê xwe bê nan ve-dixwî? Ha ji te re vî nanî pê re bixwe. Şivan spas kir ji çivîkê re û ew nan bi şîrê xwe re xwar û pişta xwe da darê, rahişt bilûra xwe ku lêxe çivîk hat li balê da-nî û berê xwe dayê got: "Ka nanê min?" Şivan şaş ma got: "Ma ne te da min ku ez bi şîrê xwe re bixwin." Ewê got "Wele ez nanê xwe dixwazim tu ji kur tînî bîne. An tê nanê min bînî an jî tê pezekî bidî min." Şî-

van got: "Çîvo, pez ne yên min in. Ez şivan im. Gava ez dagerim wê xweyê pez, pez ji min bixwaze. Ezê çawa bidim te?" Çivîk dîsa ji ya xwe nehat xwar kir eks.

Şivan rabû ji bê çareyî pezek ji keriyê veqetand û da çivîkê. Çivîkê rahişt pezê xwe û bi rî ket. Çû li gundekî leqayî dawetekê hat. Def û zirne lê didin û govenda xwe digirin. Li a-liyê din jî sîtilen wan li ser kuçik rîz kirîne û xizan in (feqîr) goştê wan nîn e ku bipêjin. Çivîk tê ba dawetvanan û dipirse. "Ka xwari-na we?" Ew jî dibêjin. "Em feqîr in, goştê me nîn e ku em bipêjin." Çivîk jî radibe pezê xwe dide wan û dibêje bipijînin û bixwin. Zaf kîfa wan tê spas dikin û vê pezê dipijînin, li dawetvanan belav dikin. Pişti demekê çivîk vedigere

dibêje. "Ka pezê min bidin min." Ew jî şaş dibin, dibêjin "Wî! Ma te ne da me ku em bixwin îca ev ci ye?"

Çivîkê dîsa dest bi eksa kir û got: "Yan hûnê pezê min bidin min yan jî hûnê bûkê bidin min." Mala dawetê ji bêçareyî rabûn bûkê dane çivîkê. Çivîk bûka xwe bir û çû gundekî din. Li wirê jî dît ku hinek zarok bi firfirêkê dileyîzin. Kîfa wî zaf ji firfirêkê re hat. Gote wan: "Ka bidin min ez jî carekê le bixim." Zarokan jî gotin "Belaş na-be. Heqê wê bide, ha ji te re." Çivîk rabû di ber firfirêkê de bûka xwe da wan. Û ji xwe re li firfirêkê da. Di ber de jî wiha disti-ri. "Fîr firr, firr.....Min strî da nanek hanî, fir û fir min pez da bûkek hanî fir û fir min bûk da firfirêk hanî ...." Çawa wiha got firfirêk ji nav nukulên wê ket û şikest. Çiroka min çû nav dehlî û deviya, rehme li dê û bavê we hemiya.



Apo, di waré parastina zimané Kurdi de. wek em dibinin û dixwinin, her yeki ji serê xwe û serdestê xwe peyvan cêdike, yan li gor zimané fermî peyvan werdigirine zimên. Ev ji astengiyek mezin e di riya pêşveçûna zimané Kurdi de. Tu vê kiryarê çawa dibini?

- Li cem Kurdan gotinek bi hêsanî dibêjin. Her tiştî em dizanin, her tiştî em dikarin. Nabêjin ez nîkarim, nizanîm, gava têr li ber di sekînîn her tiştî nizanîn. Têr dibêjin. "Apo ziman gelek zehmet e." Pêşyên me, bav û kalêne me, ehemiyet nedane zimên. Iro em bermayen **Meleyê Cizîri, Ehmedê Xanî** dixwînin. Em dibinin tiji gotinê Erebi ne. Iro Kurdêن bakurê Kurdistanê pîr ziyan digi hînîn zimên.

Wan gotina serbajêr ji ku anîne? Ji kîjan ferhengê? Wan ji zimané Tirkî peyva- baskent wergerandine Kurdi û xistîne zimên. Lê di Kurdi de li hemberî vê peyva Tirkî peyvek Kurdi ya kevin heye ew ji: Paytext e. Ev yeka hanê ku Kurdêne me dikin, saştiyeke mezin e. Iro bi xwe nahezin ku ci dikin?

Lê sibe di pêserojê de wê dawiya kiryarêne xwe bibînin. Kesî ku vê yekê cêdike, ew dixwazin destêne xwe têxîn nav gola zimané Kurdi ya zelal û dixwazin biherimîn. Ev e bû 35 sal e ku ez li ser zimên dixebitîm. Ez 3000 peyv dizanîm. Lê ziman ne ev e. Zimané Kurdi mîna derya bêbîni ye. zimané me hê nehatiye parastin û civandin. Divê xortêne me pêmahiyê çandî bixwînîn û her yeki karê xwe bike û karê yê din neke.

Apo, zimané Kurdi yek ziman e. Lê mixabin, heya roja iro, bi du-sê tipan tê nîvisandin, ji bo vê dozê ci çareyi jê re dibini?

- Tipen Latîni. Cimki tipê Latîni, mafê dengen zimên bêtirî ji tipen Erebi û Kirili dide.

Konferanseke çanda Kurdi mîna konferansa Parisê ji bo zimané Kurdi tu pêwest dibîni yan na?

- Belê gerek e, lê heyf, peyayêne tune ne, zimanzan tune ne.

Apo, iro érişike zimanî li ser zimané me heye, jêderê vê érişê ji hundir û derue ye. Ev ji aloziyeke peyde dike û yekîtiya zimên dihejîne. Bi baweriya min, avakirina dam û dezgehîn zimanî, bi rengeki yek-navendi mina korî (akademî) zanyari ji bo yekbûn û pêşvebirina zimané Kurdi tu ci dibêji?

- Rast e bavo. Gava peya hebin, divê têkevin nava gel, peyvan û gotinan bicevînin û binivîsinin û têxîn nav ferhengê. Cimki pîr peyvîn Kurdi yê ku nehatine bîkaranîn, di nav êl û esîrên Kurdan de hatine belavkirin û vesartin. Iro navên weki **Shakespeare, Molierre** û **Goethe** yê bi Fransa. Almanya û Ingiltere qet nayê ji hev

ku ziman ji nexwesiyê xelas bikin û sererast bikin û deyîn ser rast. Bila hêdî hêdî binivîsinin, bixebitin û bingehêk ji bo korî zanyarî amade bikin. Gava ev dezgeh çêbibe û peyayêne wê hebin û bi zanîstî bixebeitin, wê ziman bi pêş keve û kurt bibe. Wê çaxê emê bermayen torî, heri bilind û wê têkeve nava tora cihanê ya hemdemî.

Apo, beri niha bi çend salan li bakurê Kurdistanê gel û ziman bi yek carî dîhate tunekirin. Iro em dibinin rewş hatiye guhertin, iro çapxane hene, pirtûk, rojname, kovar têne çapkirin. Iro amoje ha Kurdi li Stenbolê heye. Tu der heqê vê rewşa nû de ci dibêji?

- Berê milet raketibû, di şeveke dirêj û tarî de razayıbû. Milet nedilîvî, xebat tune bû. Gava livek biçuk çêbû, hatin **Dr. Sivan û Seid Elçi** kuştin.

Cimki ew dixwestin gel şiyar bikin. Iro rewş ne weke berê ye, bi saya Partiya Karkeren Kurdistan gel çavêne xwe vekirine, berê kor bûn. Gel di tariyê de dijiya, iro derketine ber rona-hiyê, berê xwe ne Kurd dizanibûn, xwe êl û eşîr dizanibûn. Dewleta Tirk, iro ne bi këfa xwe

ye. Ev doz, ji destê wê derketiye. Iro soreş li welêt e. Ez dizanîm mîlet bi dil û can û mal tevî soreşê ne. Milet xelasiya xwe di vê şoreşê de ditiye. Iro irada (vîna) gel hatiye cespandin, li ser dewleta Tirk.

Apo, iro em dibinin xortêne me yê nîviskar gelek gav pêşve avêtine û tora Kurdi ya nûjen bi pêş xistîne. Nemaze di warê pexsanî de / çirok- serhat- şano. Tu der heqê van de ci dibêji û tenbiyên te li wan ci ne?

- Tenbiya pêşin ez dibêjim, nîvisarê kevin bixwinin. Ê ku di **Haydar, Ronahi** de hatine nîvisandin, bixwînin. Bila berê xwe bidin nîvisarê pexsanî, bila çirok û serhat binivîsinin. Helbest, zimané Kurdi tu carî bi tenê temsîl nake. Çirok û serhat bêtirî ji helbest, zimané Kurdi bi kar tîne.

Apo, hin serhatnîvîs û çiroknîvis hene. Piçek nîvisarêne wan, ji jan û eşâ gelê xwe dûr in û nîvisarêne wan ji tiştîn qalikî diaxive û mijûl dibe. Li hêla din, gelek nexwesiyêne civakî û pirsgirêkên civakî yê ku gel jê dinalin. Ev nîviskar berê xwe ji van tiştan diguhînîn û li ser van babetan nani-visinîn û çareyekê ji wan re nabînîn. Tu der heqê van de ci dibêji?

- Cimki ew bi xwe qalik in, ne peya ne, ne peyayê mîletê xwe ne, dixwazin xwe bikin peyayê mîlet. Welê ez bawer dikim. Iro em dibînin, ku Picasso û İspanya bi hev ve hatine girêdan. Ji ber ku **Picasso** li ser welatê xwe İspanya û derd û kulê wê xebitibû. Iro navên weki **Shakespeare, Molierre** û **Goethe** yê bi Fransa. Almanya û Ingiltere qet nayê ji hev

## HEVPEYVÎNEK BI OSMAN SEBRÎ RE – (2)



## 'BI ZAROKÊN XWE RE BI KURDÎ BIPEYIVIN'

dûrxistin. Baweriya min ev e, her kî nîviskar, nêzîkî ês û jana gelê

xwe ye, her kî dibe neynika welatê xwe, bila dakevin nava gel. Hemû bi derd û bela ne, ne xem e ci nîvisandin e, çirok yan serhat, yan şano, hele bila carekê berê xwe bidin mîletê xwe, civaka xwe, bi hezaran babet ji bo nîvisandin hene. Gava ev babet bête nîvisandin, bi rengeki toreyî û bi çarekîrin.

Ez dibêjim wê pîr tiştîn spehî bête afirandin, wê çaxê navê Kurdu û Kurdistan, di tevgera tora cihanê de cihêkî berz û payeke bilind wê bigire. Em giş dizanîn **Xanî** ki ye? Em giş nas dikin **Celadet Bedir-xanî** ki ye û ci kir? Yan **Memduh Selim Beg** ki ye? Lê em nîzanîn çawa gelê xwe şiyar bikin û mafê

bête nîvisandin û bi rengek fermî, ev ji aloziyeke mezin peyde dike.

Ez ji gelê xwe yê li Kurdistanâ bakur hêvî dikim bi zarokêne xwe re bi Tirkî nepeyivin, bi zimané Kurdi yê zîkmakî bipeyivin û xwedîtiyê li şoreşa xwe bikin ta ku hûn bigîhênerxwebûn û azadiyê.

*Tu gotinê te hene Apo?*

- Ez we zor spas dikim, li ser vê hevpeyvîna xwes û hêvidarim riya rojnameya Welat herdem riya pêşcûn û serkeftinê be.

Ez ji bi navê rojnameya Welat te spas dikim û ji Xwedê gat dikim ku, te biparêze û temenê te dirêj bike û her bimîni bi xweşî.

**Hevpeyvîn:**  
**Fener Rojbiyanî**

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwendî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyârî Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullâh Keskin • Berpirsiyârî Nîvisaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyârî Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyârî Fransa: Amed Jemo • Rue G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ